Tîrêj

Cûdî



Dîwana siyemîn

Helbest

Dîwan: cûdî
Danyar: Tîrêj
Derhêner û Kompiyûter: Şengo Dumilî
Çapa yekemîn
Çapxana Emîral
Beyrût – Libnan
Avdar – 1998

-Sipas ji bo hêja ibrahîm heso nevyê sedayê tîrêj ku nivîsa vê pirtûkê amade kirye. Ibo_kurd84@hotmail .com

****

Wêneya min ezê barkim ji dinyê
Li wara tê tê bimînî reng û nîşan
Xwezî min zanîba jaro di pey min
Gelo wê te çi hal be ey perîşan
Bi dil sozî milet wê li te binêre
Weya xod tê bimînî bê cih û şan

Diyarî

Vê dîwana xwe ya nû digel silav bi bara
Pêşkêş dikim diyarî ji bo kurê xwe Dara
Ji welatê xwe dûr e li   welatê   xurbetê
Xuşk û bira,dê û bav tevde hiştin li wara
Reng û nîşan û sawêr ji ber çavê mi naçin
Ne bi gav û ne   se'et ne bi roj û êvara
Gelo heye bibînim dîsa wê bejn û balê
Bi temtêla cembelî li zozanê hekara
Ev   dewr   û   dem   û   zeman   me'j   hevdû ratqetînin
Belakirin ji hevdû li   welat û   bajara.

Tîrêj
21-3-1998

Pêşgotin

<u>Jînenîgariya Seydayê Tîrêj:</u>

Di sala 1923 an de li gundê nicmê li herêma Qamişlokê li parêzgeha cizîrê hatiye dinê. Navê wî yê zikmakî nayif e.
Ew kurê heso ye. temenê wî şeş - heft salî bû, dema bavê wî mala xwe dibe sêmitikê. Ew li wê derê û li cem mele ibrahîmê golî Qur'an û çend pirtûkên olî dixwîne. Di sala 1937an de li ser daxwaza seydayê xwe berî dide dibistanê li bajarê Amûdê dixwîne.
Li wir pênc salan çûye dibistanê. Lê ji ber mercên abûrî xwendina xwe negihandiye serî. Li wê derê, têkiliyên wî bi çend mirovên welathez û miletparêz re çêdibe, (Seydayê Cegerxwîn,Qedrî Can,Hesen Hişyar,Nûredîn zaza....) Evan helbestvanan û rewşenbîran bandûreke mezin li seydayê tîrêj kirin û bûne sedemê derbûna çavkaniya evîna nîvsandina helbestan li nik wî. Bi wan re xebata niştimanperwerî kiriye û mîna gelek welatperwer û gelparêzên kurdan ewî jî di nava rêxistina xoybûnê de cihê xwe girtiye.

Di sala 1952an de bi destê parastinên zorkar tê girtin û dîwanek wî destnivîs talan dibe. Piştî vê girtinê,seydayê tîrêj xwe ji ber çavan dide alî û xwe diparêz e. Vêca berî dide nav erebên cibûran û li wir bi cîwar dibe, heta bi sala 1973an de. Seyda vê paşiyê li bajarê hisiça bi cîwar dibe.

Seydayê Tîrêj û Helbest:

Seydayê tîrêj, li ser şop û riya helbestvanên berê yên kilasîk dimeşe. Di vî warîde, dibêje: (ez li helbestê bi nezim,awaz,qafiye,(serwe), û naveroka wê dinêrim. Ev her çar tişt wê dikin helbest).

Seyda, van her çar şertan ji bona helbestê dixwaze. Ev şert jêre dibin per û baskên balayeke baz, ku bi yek firê xwe li baskê ezmana dide û xwe, ji jor de, bera kûrahiya tor,folklor û helbesta kurdî dide. Lê , li pişta evî bazê serbilind bazekî bêhempa heye, ew jî seydayê nemir Cegerxwîn e. Cegerxwîn baş bandûra wî li helbestên seydayê tîrêj heye û hem xurtî û germiyekê dide ristên wî û di yek deryayî de melevaniyê dikin.

Lê, ne her kesên dest dirêj yên ku xwe dixin rêza nivîskar û helbestvanan dikarin di derya evînê de melevaniyê bikin.

Linik seydayê tîrêj, bejna helbestê pir bilinde. Bi xeml û xêze. Bi kêş û serwe ye. bi rewanbêjî ye. bi pesn û halan e. Bi halanên rojave ye. ji jîna jîwerî ye. ew e ya ku di nav hêvî û kovanên gel de hatiye stirandin, û li ber ronîkirina riya xebatkar û ronakbîrên rizgarîxwaz hatiye meyandin.
Vêca em dikarin bêjin: seydayê tîrêj yek ji wan helbestvanên ku bi gelê xwe ve girêdayî ye. û nêzîkî rewş û jîna wî ye.
seydayê tîrêj di helbestên xwede, pir bi xweristiya kurdistanê ve girêdayî. ne tenê di helbest û nivîsên wî de ev diyarin, belê navê hersî dîwanên wî jî vê nerîna me bi cî dikin. Navên dîwanên wî (Xelat,Zozan,û Cûdî) ne.
seydayê tîrêj, heftê û pênc salîye. Berê dara evîna wî şîn e. Lê xweş diyar e, berên daran bê talayî şêrîn nabin û ne spehîbûnê didin. Tenê şêrîniya gulê bi dîtin û şîravê xweşe. Lê ya xweştir ewe ku bilbilekî şeyda bi deh hawan bixwîne û pesnê gulê xwe bide.nih wê gulê xwebibîne û bi naz û kubarî li ber sura bayê sibê serî bihejîn e.
seydayê tîrêj, di helbestên xwe de, folklor pir bikartîne û hem rewş û nav û nîşanên civakî di helbestên xwede derbas dike.
Helbesta siyamend û xecê xurtiya helbestî linik seydayê tîrêj dide xuyakirin.

Seyday, ev çîroka folklorî ji berzebûn û mirinê reha kir, û bi toreyeke bilind û zimanekî rewan nivîsand, û li ser hawê Mem û Zîna Ehmedê Xanî hûnand.
Lê, tiştê herî balkêş ew e ku agirê raperîn û şoreşê di dil seydayê tîrêj de roj bi roj gurtir û xurtir dibe li hemberî setem û zorkariya li ser neteweyê kurd û sedemên bindestiyê, û ji bo rizgariya kurdistanê pêwîste têkoşînek yekbûyî û canbêzariyek bê sînor bi hunermandiyek mezin û bi zimanekî şêrîn û rewan aniye zimên.
Dîwana seyda ji sê biran pêk tê: pêvî helbesta pêşî ya bi navê siyamend û xecê, (berê civakî û perwerî,berê evînî,berê diyarî û şînî) seydayê tîrêj sê dîwan (xelat,zozan, û cûdî) û pirtûkek bi navê serpêhatiyên kurdan nivîsandiye. Hinek kurteçîrok û mewledek bi zimanê kurmancî ne çapkirî heye.

Dilawerê zengî
21-3-1998

Birrê

Civakî
û
Perwrî

Bîranîna Mem û Zîn

Ey dil here vê cejn û eydê
Ser gora mela li bayezîdê
Ramûse tu kêla ber serê wî
Rûnê bi edeb li hemberê wî
Bê ey xaniyê pispor û zana
Taca ser serê me torevana
Şalûrê hekar û çayê hîzex
Wey bilbilê bayezîd û şernex
Ey totiyê birc û şehneşîna
Şehbazê erarat û metîna
Ey perwerê hêzil û çemê şet
Bîngol bû ji hêstirên te derket
Aşiq timî hêstiran dirêjin
Şi'r û xezela li ser dibêjin
Xemkêşê welat ji ser heya bin
Xema te dijî neyar û dijmin
Xema tebû şûrê rustemê zal
Guhderzê zeman bi şewket û al
Pîroz dikim ez bi şad û mizgîn
Sêsed salya dîwana Mem û Zîn
Xweş ferheng e û tarîx û tor e
Nûbare di her zeman û dewr e

Te b'xwîna xwe ceger bi dilkî şûştî
Ev tora bilind ji bo me hiştî
Seyda ev zemanê ku bi lez têt
Gavek bi tenê me pêş ve navêt
Sêsed sale ev we tê jimartin
Ev dewr û demên ku tên guhartin
Ev zerf û zeman û çerx û dewran
Karek me nekir nebûn xwedî şan
Rêçek bi kelem em ber bi kaşin
Gavek me li pêş du gav li paşin
Karwan bihurî ji me hejaran
Em kurd bi tenê mane li wara

Karwanê demê gihişte dozê
Em mane di nêv dûman û tozê
Kîn girtine rêberan ji yek dû
Herdem ew bi poşan têne hevdû
Qurpîna quloça şer giran e
Kî berxe ji wan bê kî beran e
Lê em xwe ji heqiyê tim didn paş
Em nabêjin kî raste kîye şaş
Heta webe dê halê me ev bî
Her dem wê li me tarî û şev bî
Sêsed sale me di vê temarê

Hişyar nebûn em ji vê xewarê
Kabûsê xewê li ser dil û can
Hana me nema li erd û zeman
Bajarê cizîrê hê cizîr e
Mîr hakime eskender wezîr e
Seyranê dikin di dehl û baxa
Beko hê li ser serê me axa
Mem hê girtiyê zindan û çala
Zîn hê digirî li ser hevala
Mîrê dil kevir bi sal û maha
Napirsî li halê bê gunaha
Harif û Çeko bi gurz û şîr in
Botan bi xwe hê bi bend û eşîrin
Tacdîn li Beko ew hê bi kîne
Sityê xemxura xuşka xwe Zîne
Wa Ducle bi bîngul hê didî rê
Sergeşte dibî li rex Cizîrê
Pêlan didî ew li reqs û gazî
Xumxum dikevê bi cengebazî
Her dem ew dikî fîxan û feryad
Heware diçî diyarê bexdad
Fîxan te kirî melayê botî
Der heqê welat wisa te gotî
"Qet mumkine ev ji çerxê lewleb

tali' bibitin ji bo me kewkeb

Şûrê hinera me bête danîn
Qederê qelema me bête zanîn"
Mizgîneke xweş didm te xanî
Istêrek me derketî ji banî
Istêra pir bi şewq û rewşen
Îro li welat xweş kirye gulşen
Istêra bilind alek di nêvî
Hêvistiye ew bi zêr û zîvî
Ew ale bi dest serokê kurdan
Hildaye li ser çiyayê berzan
Gêr dane li dor sîpa û leşker
Pêşmergên dilêr bi hêz û tevger
Peywaneyê wext û çerx û rojin
Herdem dilê dijminan disozin
Şûna arê pilingê çerxê gerdûn
Berzanyê nemir bi şer' û qanûn
Şûra hunerê ji bo me danî
Navê kurd li dinyayê deranî
Kevnare xwedî tarî û tore
Koka kurd di dîrokê de kûr e
Ger ku ne wa be dimaye winda
Kawik û nezanî û ne xwenda

Ev tazî û rom û tirk û faris
Me ji hevdû dixin wek nanê garis
Sed heyf û mixabin mîrê torê
Hesretya welat bi ter çû gorê
Çerxa felekê zincîr û piştî
Ev barê giran li mil te hiştî
Rabe wek berê rahêje xamê
Binvîsî ji kurda re tu namê
Gazî bike wam bela bibin yek
Da goga xwe vê demê bibin şeg
Ger dûr bikeve kerwanê jînê
Furset wê here em nagihînê
Pir şerme gelo ma em ne xurdin
Vê firsetê em ji dest xwe berdin

Zanim hindeke tiştê me danî
Fexra me tuyî melayê xanî
Xama min çiqa li ser te bêjî
Hêsran ew li rûpela birêjî
Pesnê te bidî bi işq û şadî
Ew yek ji sedî heqê te nadî
Sed carî pîroz dikim mem û zîn
Yezdan ji tîrêj qebûlke amîn.

Buhar

Buhar dem û dewra minê
Serpişk û hem para minê
Bax û gulîzara minê
Mêrg û gulîstana minê
Rewşa dinê kêfa dila
Cê 'ndelîb û bilbila
Derman dikî derd û kula
Xweş geşt û seyrana minê
Dem tu tê şa'ir li ser
Mizgîn didî can û ceger
Şi'r û xezel vedbin li der
Helbest û dîwana minê
Xemla te nîşana zemîn
Kulîlk bi sed reng û bi bîn
Şa'ir li ser te har û dîn
Adar û nîsana minê
Adar û nîsan û gulan
Xemla te heft rengê gulan
Mirxo bi kewt û xulxulan
Newroz û sersala minê
Şa'ir bi te serxweş dibî

Sukran û mest bê hiş dibî
Xemkêş bi te dilgeş dibî
Bade û meyxana minê
Kulîlkêd kesk û sor û zer
Şebnem di nêv xunce li ser
Bêhn û bexê davêjne ser
Xweş misk û rîhana minê
Xweş misk û rîhan û gulav
Şev pêde her lê tê xunav
Bayê siba der tê ji nav
Xweş çax û dewrana minê
Kulîlk û rîhan û giya
Gulşen dikin çol û çiya
Lûsê xezal û koviya
Rewşa kurdistana minê
Xweş çaxe xweş dewran û dem
Fikr û xeyala min li cem
Pesnê te têr nadî qelem
Tu sebr û samana minê
Wextê mi çû bûm pîr û kal
Emrê bû heftê û di sal
Dunya mi dî keys û fesal
Soz nîne ramana minê
Dunya li tîrêj bû xelek

Zor û setem dîtî gelek
Gog bû li ber kaşwê felek
Sergol û meydana minê.

Nîlson mandêla

Nîlson mandêla pêşayê mezin
Serdarê milet çi mêr û çi jin

Tu ma girtiyê zindan û çala
Demek pir dirêj bîst û heft sala

Te por sipî kir wek hirî û kak
Tu l'ser ya xwe ma gernasê lebak

Te têde dîtin gelek derd û êş
Jîna ciwanî te da xerc û bêş

Te serfiraz kir efrîqa başûr
Ji destê dijmin bi kotek û zor

Hezar aferim rêberê milet
Li te pîroz be ev tac û sewket

Xwedî bawerî şêrê bi zincîr
Ne hişt li welat te bend û eşîr

Te reş û sipî kirin wek hev
Destê biratiyê teva dane hev

Te kîn û rik û berberî nehişt
Azad bû welat te kir wek buhişt

Ji te sêpase her demê tîrêj
Te nekir ber xwe wîsama qirêj

Remza Etaturk nîşana gemar
Te qebûl nekir qet ew yadîgar

Bi wê wîsamê qîma xwe nanî
Tu xweş bihalê kurda dizanî
Ev tiştê te kir ey serokê jîr
Gelê kurdistan qet nake ji bîr

Tu xweş bawer be Nîlsonê dilêr
Emê bivîsin wê bi ava zêr

Ewê têkevî bi soz û peyman
Pelê tarîxa kurd û kurdistan

Bijî mandêla dijî şer û ceng

Ew aştîxwazê bi nav û bi deng

Bimrî berberî ew setem û cor
Nemînî şerxwaz here gor bi gor

Ev cîhana xweş hemî dehl û bax
Ava bimînin ev birc û qûnax

Bijîn wek bira têde reş û gewr
Nemîne setim ew çax û ew dewr

Tîrêj dibêje bi dilkî geş
Bijî mandêla se'eta te xweş.

Buhar hatiye çogê

Serhilde ji xew ey kurdo roj hate delava
Tamara xewê girtiye ma ser herdû çava
Hayê te ji bayê felekê nîne xewaro
Kêlek li te hişk bûne li ser merş û kulava
Kerwan buhir derbaskir û ket warê jiyanê
Maye tu tenê îro di nêv av û çarava
Dunya bûye sayî bese çarakê bibîne
Serma çû nema dengê birûsk û ewr û tava
Marmara mî û berxa buhar hatiye çogê
Di çirûsin kulîlk vêga bi şebnem û xunava
Xemla xwe girêdaye zemînê bi kulîlka
Bihn û bexê davêje wekî misk û gulava
Wa bilbil û şalûr ew li yek hawî dixwînin
Şîrşîra tulûran ew dison cerg û hinavan
Ma qey tu ker û lalî çima deng ji te nayê
Rabe ber bi jînê ve belengazo du gava
Aştî ketiye dinyê ger tu mafê xwe nexwazî
Tê xurde herî jaro li ber pêlên di ava
Bê çare bimînî tê di nav toz û icacê
Seyda te nema tê dest bi nêçîr û bi rava
Dem hatiye wek zêre ji destê xwe tu bermed
Firset ku here nayê bi daxwaz û bi lava
Dewra teye poşman nebe barê xwe li êş ke

Aşê demê wek baye li ber şîba sîlava
Şêrîne welat taceke zêrîne birader
Nefroşe bi erzanî bi dînar û derava
Dotmam dike gazî ew li pismamê xwe îro
Rabe tu xwe rapêçe ji bo bejin zirava
Azad bike dotmamê ji nav pencên neyara
Da îro bi dil şahî bibî bûk tu jî zava
Govendeke çar goşe li meydanê li darxe
Da deng bide kurdistan bi mizgîn û silava
Wek tîrêj dibêje dem xweşe rabe xebatê
Ger ranebe ser xwe wê roj li te here ava
Şevreş têkevî erdê nema berxwe dibînî
Wek kora heval tê têkevî nav bend û dava.

Nîşan û gerafêt

Ev sedamê dîn û har
Bê bext û şerm û fehêt
Xwînrêjê gelê Iraq
Neyarê jîna welêt
Piştî cenga Îranê
Pey şewata helebçe
Hê têr nebû ji xwînê
Êrîşek daye kuwêt
Bi tank û top û leşker
Bi sarûz û balafir
Ew bajarê wek buhişt
Li wan kir agir û pêt
Eba û desmal û igal
Hemû ketin nav niga
Î ku kuştin yê revîn
Dê dergûşa xwe avêt
Nehsed bîrê betrolê
Tev kir dûman û agir
Çar hawîrê kuwêtê
Kir lexem û dînemêt
Mal û milk û zîv û zêr
Tev kir yexme û talan

Kavil hiştin xan û man
Dan erdê dîwar û hêt
Lê qet nehat bîra wî
Wek ku ahê vî destî
Ji destê dir namînî
Dewrana dem wisa têt
Inglîz û ferensa
Emerîka lev civîn
Ava serê wî danîn
Li bajarê Wûtirgêt
Bi hezara balafir
Firandibûn ezmana
Ji bajarê kuwêtê
Heya bexda û ferêt
Balafirên ezmana
Qenabilên dinapalm
Wekî tevê teyrokê
Ji her alî ve davêt
Leşkerê jar û reben
Du sed hezar berbat bûn
Sed hezar jî birîndar
Tev dimane şel û şêt
Lê kiribûn terpe toz
Nema riya ber xwe dît

Lê bûn bela mexabin
Ew nîşan û gerafêt
Ev tevde xerc û bêşa
Gelê kurd e te danîn
Li şûn nîşana bidrû
Reş pînakî ji dûbêt
Wekî tîrêj dibêje:
Her bimir bê veger
Ew dem û dewrana çû
Nema bi dest te ve têt.

Bûka ser bi xêlî

Bi kuncîlên hevir mêşî
Li ser textê sedev rûnim
Di nêv baxê buhiştê de
Ez zozanê xwe pê nadim
Eger xanîk bi sê maxan
Li topraxa welatê min
Bi beşt û pûş û mircaqan
Bi brca Babilê nadim
Eger mîna Huseynê pak
Ku teşnê Kerbelayê bim
Piyalek ev ji Bîngolê
Bi ava kewserê nadim
Eger mistek ji wê axa
Welat ez bîn bikim her dem
Kulên mi tev ji dil der tên
Bi misk û enberê nadim
Zixur û kevr û heftokên
Çiyayê Dêrsim û Sason
Bi elmas û bi yaqût û
Bi dur û cewherê nadim
Metîn û Serheda nadim

Bi Evrist û Hêmalaya
Ferat û Dicle û Xabûr
Bi Nîl û mermerê nadim
Keça kurd ew bi xemla zer
Li ber çavê mi dîdare
Bi Zenûbya di gel tacê
Li tectê keşwerê nadim
Glac û zikreş û bidgo
Çi bêjin ew bila bêjin
Tucar dîwan û helbesta
Ji nav destê xwe bernadim
Sehê çibkin bi kewtkewtê
Eger kerwan bi rê da bî
Tucar ez peyvê dixsokan
Di hûçkê xwed girê nadim
Edîb û rêber û zana
Bi êrîş têne min îro
Neyarê tor û tarîxin
Ji wan re ez tu rê nadim
Eger rastî dibêjin ew
Bela dakevne meydanê
Tîrêj im ez ne winda me
Ji farqînê kurê Pad im
Kekê Yadoyê zîlî me

Serek hêzê Eraratê
Peyê Ihsanê Cibrî me
Li Bedlîs geh li Midyad im
E şevgêr û şoreşvan im
Li kohê Zozilk û Berzan
Bi xwe pêşmergê Qazî me
Ji bajarê Mehabad im
Li sîpanê xelatê ez
Siyamendê silîvî me
Li şûnwarê evîn daran
Memê Ala û Ferhad im
Dema sersal û newroza
Ezê tim agirê Zerdeşt
Li Şingal û li Zaxros û
Hekar û Hewlêrê dadim
Ji bûka ser bi xêlî re
Serek berbûme ez îro
Di meydana cirîdan de
Siwarê hespê terwad im.

Çikûs û comerd

Malê dinê tev yê te bî
Kêr nake bê dost û heval
Bê ap û pismam û xwedî
Bê metik û xaltîk û xal
Ew dewlemendê mal genî
Şaşe di vê rê de gelek
Pîs û çikûs û çav nexel
Kolê derav û milk û mal
Bira di roja tengiyê
Tucar tu hêviyê jê meke
Mûma vemirtî şev reşa
Nadî kesî şewq û şemal
Dara biyê tim bê bere
Çiqa vede şax û gulî
Ava heyatê petrîşok
Pê nabe şêrîn maye tal
Zengînê comerd tim hebe
Berxweş e wek mêwa tirî
Her dem li dorê kom dibin
Bê çar û jar û bê mecal
Mîşê û daristane tim

Şîne li hevrazê çiya
Tev mişmiş û sêv û bîhok
Havîn geha şêr û şepal
Germa tebax û tîrmehê
Pêlek ji bayê serhed e
Kanîk ji bîngolê ye ew
Jê der dibî avek delal
Teşnê riya dûr û dirêj
Tihna xwe pê dişkîne ew
Rengê şerabe mey xweş e
Dermanê derd û êş û hal
Xwedyê derav û zîv û zêr
Dawî tê dest vala here
Ey rêwiyê çûn bê veger
Çipkî ji vê dunya betal
Zendî li ser gora te dê
Axa cebana kom bikin
Bi ya tîrêj bik tewş meçe
Ber destê yezdan gêj û lal.

kor û diya xwe

<u>Kor</u>:
Keçê dayê kel û kor im ji dîna hemdem û yara
Bi destpelkê diçim û têm li ber van hêt û dîwara
<u>Dayê</u>:
Bi çavkorî ne dilkorî me'erî wek tebû Cengo
Serokê tor û çandê bû li gund û şehr û bajara
<u>Kor</u>:
Ji dînaya dinê dûr im di van kuncên reş û tarî
Hejar û dilfekar im ez esîrê roj û êvara
<u>Dayê</u>:
Buşar jî wek tebû Cengo di hiyamê xwe yek tabû
Şehê textê edeb bû ew di nîva kom û guhdara
<u>Kor</u>:
Evî tiştê ku tid bêjî bi min wek xewn û nîgaşe
Gelo raste bibim carek yekî zana ji Kurda ra
<u>Dayê</u>:
Bixîne tê wekî Taha bibî pespor û hozanek
Ji milet re biderxînî dehê pertûk û dîwana
<u>Kor</u>:
Bi destê min bigir dayê berê min bid dibistanê
Bixwînim da nemînim ez hevalê pîs û bêkara

Dayê:
Sipas û aferim Cengo bi zana re bid û bistîn
Tu dê bighêje armancê tu namînî li şûnwara
Kor:
Bi sozê her kesê çê ez ji dev doza xwe bernadim
Eger dijmin di vê rê de berê min bidne sêdara
Dayê:
Di Kurdan hene Cengo bi çavin lê bi dil kor in
Di bin cengê me de îro wekî topişk û reşmara
Kor:
Wekî tîrêj dibê arê li nav çav û serê wan be
Neyarê miletin dostê neyarin her dem û cara.

Newroz

Ey newroz newroz newroz newroza min
Sersal û cejn û geşte dil soza min
Tucar terka te nakim pîroza min
Li dunyayê tu daxwaz û doza min

Vejînim agirê kawa li wara
Timî dadim li ser şaz û zinara
Bi kîn û rik li ber pozê neyara
Tu şêrîn û mizgînî newroza min

Cergê dijmin disojî agirê geş
Li kurdistan dikî rohnî şeva reş
Ji bîr nakim tucarî vê dema xweş
Şahî û xemrevênî newroza min

Keç û xort tên semayê şademanî
Bi şal û şap bi xemla zer mîtanî
Felek tê xwar ji birca asîmanî
Ji te xayiz dimînî newroza min

Bi rewşa te cîhan pêkve didî deng
Kulîlk û çîçek û nêrgiz bi sed reng

Li rû qadê dibin wek reqşê Erjeng
Buhar xwed xemilînî newroza min

Giyayê şîn didî pêlan li deştê
Awazê bilbil û mirxan çi xweş tê
Bi perwazan dikin seyran û geştê
Ji mer herdem bimînî newroza min

Bi dev xamê dikim hawar û qêrîn
Mehmûd rabe ji gorê xortê bengîn
Xweha zozan tu sê denga bilîlîn
Hêza dijmin dişkênî newroza min

Bêrîvan rabe ser xwe porsora min
Dev artêşê bidî pêsîra min
Ku şêr şêre çi mêr be yan çi jî jin
Heyfa Leyla hiltînî newroza min

Li Barzanî serokê qehremana
Li Qadî û Se'îd û pehlewana
Tîrêj herdem li ser wan pakrewana
Wekî bilbil dixwînî newroza min.

Pirsa Diya Ciwan

Dil dergehê xwe kilît kir
Kilît di derya werkir
Kî bi canê xwe diborî
Xwe ji bo dil bike gorî
Xwe noq bike bin avê
Kilîtê derxe dil ew divê

Bersiva wê

Xuşka delal û pir bedew
Kulîlka ser şaxê lema
Dergeh li dil girt û kilît
Avêtiye derya xema

Pîrê xem û derda me ez
Tim xesteyê rinda me ez
Rêberê rê winda me ez
Xesma di her çax û dema

Bo herdû çavên reş belek
Wek Macilan b'geşt û kelek

Derya li hev dim yek bi yek
Heta bi behra Qelzema

Hûtê binê behrê cîhan
Ez dê bi hawarkim li wan
Da bêne hana min ji can
Çaxê ku çara min nema

Hawar bikim roj û şeba
Hawar bikim pêlên di ba
Hawar bikim hov û teba
Murxên li dor av û çema

Dakevme derya b'dest û mil
Derxim kilîtê deste gul
Dergeh vekim dîsa li dil
Tîrêjo dil para te ma

Dil cewhera kurdê b'şeref
Her ew e armanc û hedef
Derxim ji nav perçên sedef
Rewşen bikî qad û sema

Dil hesreta kurda ye ew
Li hêviya merda ye ew
Şahê kul û derdaye ew
Çibkim ji zêr û derhema.

Bibin yek

Destan bidin hevûdû bese êdî bibn yek
Gog hatiye ber kaşo divê em bibn şek
Bi çoganê berxwedan lêxin mednê tu yefşê
Dem ku here nayê zû derenge çerxa felek
Tev bi bîr û bawerî ji dil werin xebatê
Dijmin bela we îro ji nexe yeka yek
Dema milet bi yek be wekî lehya giran e
Tutişt li ber xwe nagre tev pêl û girgirînek
Bi kerwanê demê re bibin heval û hogir
Li ber we kes xwe nagre ne axa ne jî beg
Li meydanê biqûrin wekî şêr û pilinga
Nevyên Guhderz û Rustem Sasan û Alê bermek
Ji ser milên xwe bavên barê sitem û zorê
Dewletek nû li darxin bi tac û text û serek
Em jî bi serfirazî bijîn di vê cîhanê
Ji welatê me pêve ji mer nîne deverek
Tîrêj çi qûte qûte barê milet girane
Haş xwek tud bin venebî dîno bela xwe jê vek
Ka seydayê Cegerxwîn xwedyê dahola mezin
Gerden li wî ziwa bû feqîro yê te dirbek
Kanîn Hejar û Bêkes ka Xanî ka Cizîrî

Kanî Feqîhê Teyran Siyapoşê çav belek
Ew torevanên mezin dixwaze nayê bi lav û dîlek.

Marê di tûr de

Li dunyayê birader em tevde hewcedarin
Riya pir dirêj e karwanin em li kar in
Barê me pir giran e serxwebûna welat e
Ev kar ji me tê xwestin dem û dewran dijwarin
Bi xwezî û bi lava nabin serî tu karî
Divê em xwe nedin paş mêrxas timî li karin
Ey hevalo mêrê çê bikêrî her tiştî tê
Li qelsmêra menêre tev qirêj û gemarin
Divê ku em xwe têxin warê piling û şêran
Kesê qels û tirsonek çavpêl û serlixwar in
Ev welatê wek buhişt bûye li me şeva reş
Pêxwas û diz û keleş binêr li çar kenarin
Mebe bawer tucaran li dijminê korfesend
Wekî marê di tûrê de qîl tûj û serbijehr e
Li me her dem dinêrin wekî reswa û kola
Li ser serê me îro hirmizê tacîdar in
Welat pir dewlemend e hemî deşt û zozanin
Hemî dehl û rez û bax pêkve êmîş û dar in
Tijî gencin axa wê madena zîv û zêr e
Rengê elmas û mircan ji rû kevra dibarin
Belê îro mexabin ev dijminê setemkar
Xêr û bêra wê dixwin em jê bê pişk û parin

Ma ne şerm û sosrete cihê bav û bapîra
Li me bûya wek zindan tev girtî û firarin
Zirûf û dewrê zeman milet wana pêk tîne
Dema ku em bibin yek bi dijminê xwe karin
Heya ku em nebin yak ewê halê me ev be
Li welatê me dijmin gurê birçî û harin
Çi kurdê ku ji şopa yekîtiyê bidî paş
Xayin û gel firoşin kurtêlxurê neyar in
Wê rojek bê ku milet wan bavê çerxa tarîx
Nake rehmê li wana hemdemê koledarin
Bese êdî bibin yek mû b'zimanê me ve hat
Pir wek tîrêj dibêjin bê hesab û jimar in.

Wê roj hilê

Pir silavê min li ser pêşmerge û şoreşgera
Xwedyê kolos û kuma şapik û şal û xencera
Hêvî û çar û omîda miletê kurd in ji dil
Hun tucar nayên şikandin qet li meydana şera
Dem û dewr tev ya weye yevşê nedin dijmin tucar
Nav û dengê we giha dewra cîhanê eşkera
Pêşketin karê we ye ey serbilind û can fida
Kelemê çavê neyara zabit û serleşkera
Hazim û Yûsif Digel Izet û Hisnî û Ezîz
Sûnd bi gorê pakrewana sûnd bi kêlê kevira
Hûn ji bîr naçin tucarî xwîna we naçî bi tûn
Heyf û tola we ji dijmin wê hilînin ey bira
Hûn ji goristana Dêrikê serî hildne jor
Guh bidêrin xweş li cenga kurd û dengê qumbera
Mij û mûranê xwe berdaye serê lat û çiya
Ceng û nav têdan û halane li şêr û ejdera
Term û laşên leşkerên sedam li her cî bûne kom
Bi hezaran bûne şîva hirç û û wawîk û gura
Banê nêrgizê û zaxo dêrebûn û pêşebûr
Tev kirin rizgar ji bin destê neyar û zorkera
Ji welat sedam bi derkev paytextê mîdiya

Cê pilinga ye ne war û cê qirêj û qeşmera ye
Te li kurdistan nehiştin gund û bajar û zevî
Pîr û zarok tê neman derketin çol û devera
Berf û bahoz qir û serma ye li ser gohêd bilind
Bê nivînin şevê tarî tevde bê mûm û çira
Kê li dunyê wek te kir ma ey berazê dil kevir
Te teymor ling û holako wan maxol û tetera
Lê bizane ev şevên tarî diçin wê roj hilê
Ala rengîn bête hildan wê li ser xan û sera
Dadgeha milet hesab wê b'ter bibînî rojekê
Wê te bavê çerxa tarîx bin dûlab û lengera
Ziblegeha dewra tarîxê cih û warê te ye
Kes li ser gora te zalim narijênî hêstira
Ez bi germî dihejînim destê mes'ûdê leheng
Kurê barzanyê nemir ew serokê şoreşgera
Her dem û gav doz û daxwaza dilê Tîrêj ev e
Leşkerê azadiyê hûn tev li ser çav û sera .

Bendê / 11 / ê Adarê

Serbilindê kurd û kurdistan û gernasê welat
Rihberê xortên fidakar jîrekê kar û xebat
Çaregahê miletê kurd serwerê xortan mela
Rengê xorşîdê cîhan îro li berzan xweş hilat
Rohnî û tava xwe da çargoşê kurdistan hemî
Kurd ji xwe tevda şiyarkir yên li deşt û koh û lat
Bîrwer û miletperest û al bi dest hildaye jor
Miletê kurd sef bi sef bûne li dor kom û civat
Kurdên berzan û ezerbêcan û eyran û ecem
Kurdên şingal û Cizîrê ta bi der ava ferat
Erdehan û qerş û batom ta bi xakî serheda
Bayezîd û şernex û wan ta bi sîpanê xelat
Wa li berzan û metîn û zozik û çiyayê sefîn
Can di meydana şeref de tê firotin bê mezat
Wane pêşmergên dilêr sîng dane ber top û gula
Pakrewana ruhê şêrîn dane mizgîn û xelat
Bendê Adarê bi mafê kurd li me kir ye buhar
Bagar û serma hemî çûn tev li kanûn û sibat
Bexçe û dehl û gulîstanên welattev xemilîn
Cok û cobar têne ser wek kaniya ava heyat
Sorgul û çîçek ji nav pencên di xara bişkivîn
Bingeha dara jiyanê wa ji bin ve daye kat

Bilbil û şalûr li yek hawî dixînin şev û roj
Tê li ser teht û şikêra qebqeba dengê ribat
Xakî kurdistan sera ser bûye lê kêf û xweşî
Siltemê koça xwe barkir bê veger ceng û şewat
Aferim sed aferim ey serbilind û pêşewa
Tev bi tevdîr û zanîna te va dewra me hat
Hemberê darwîn û napilyon û xandîw hoşemîn
Qehremanê çerxê bîsta şêrê zozan û kelat
Her bi bîr û bawerî tîrêj ku migînê didî
Miletê kurd namire wê hebe roja felat.

Birîn li ser birînê

Dikim pîroz û mizgîn vê kongir û civînê
Li bajarê dihokê li vê dewra zemînê
Bi hêvî û omîdim gavin xurt û firehtir
Ku hûn bi pêşde bavên bi zanîn û yeqînê
Bi govenda demê re divê em pî li ba kin
Pir bikin dost û yara ne bes bi çav nerînê
Eger ne reqsevan bin tu kes destê me nagre
Kesê neqlê neyînî bê pişk û par dimînê
Silavê min bi bara li canê pakrewana
Li şewityên helebçe kuştiyên xaneqînê
Li xwîn rêj û şehîdên çayê şingal û hemrîn
Li zozik û helegurd li berzan û metînê
Gelo heya çi wextê emê xwînê birêjin
Bi texmîn û qiyasê bû wek çemê sefînê
Laşê gernas û mêra ji ber gulê neyara
Nemaye cî ji derdan birîn li ser birînê
Tilî nema xwe digrin li çeqmaqê tifinga
Zingirîne ser û bin ji germê tev ji tînê
Axa welat seraser çiya û deşt û hêrik
Kort û newal û mesîl toq bûne tev ji xwînê
Cok vebûne dirwên naz û delal û rinda
Ji hêtirên li pey hev ji ber şîn û girînê

Divê mejyê xwe bêtir em têxin ber xebatê
Belê rext û tifinga navêjin ser kulînê
Neqeb nemînî vala ber êrîşê neyara
Divê tim li kar bin di kozik û kemînê
Bi aştî û tekûzî rabin kar û xebatê
Dîmoqratiyê bixwazin ne b'agir û rivînê
Kurdistan dewlemend e me'dena zîv û zêr e
Komir û neft û hesin derxin ji jêr zemînê
Wek miletê cîhanê daxin bi ser bilindî
Bajar û şehristana firotin û kirînê
Kurdistan wek buhişt ava bikin seraser
Da bên seyran û geştê ji Ewropa ji Çînê
Daxwaza dil tîrêj serxwebûna welat e
Em jî bi serfirazî têkevin warê jînê.

Di tarîxê de dewletek Kurdî

Di dema serketina kurdên başûr de (1991) û dewleta xwe avakirin min jî bi vê nameya helbestî pîroziya wan kir.

Birêkev nameya ku min bi xwîna dil nivîsî
Bi ber banga sibê re pir bi kêf û şademanî
Li ser baskê kevoka perheşîn û semawî
Ji min bigêje gora mistefayê berzanî
Ji dêla min tu ramûse du kêlên ber ser û pa
Tu mizgînê bidê kurd serfiraz bûn wek tu zanî
Li başûrî welat millet giha arming û doze
Sitem barkir dîmoqratî kete dewra cîhan
Gelek xêrxwaz ji merbûn hemdem û piştmêr û destpik
Di tarîxê de hîmê dewletek kurdî me danî
Dizanim ku omîda te di gerdûnê de ev bû
Derkev ey serokê min bi kêf neb dilgiranî
Ji ser gorê li ba kev ey tu peyxama mi dîsa
Di wextê de tu bighê gom û cebha kurdistanî
Silavên min bi bara bik li wê kom û civatê
Bidê sed aferim derdê dil kurd web cî anî
Gelek sêpas ku warê dewleta mîdya we şînkir

Ji berya sê hezar sal paytextê abtîkanî
Erê keyxesrewê mîdî xudanê tac û eywan
Serî rake ji gorê xweş binêre vî zemanî
Eva nevyên te îro her wekî şêr û pilinga
Welatê te kirin rizgar ji bin destê biyanî
Bişîn kev ey welat her dem wekî benga buharî
Ji nêrgiz û kulîlkêd kesk û sor û ercewanî
Çiya û deşt û zozanê welat xemlê girêdin
Bi êmîş û berê dara bi bax û dehl û kanî
Li ser wan terh û şaxan bilbil û şalûr bixînin
Welat pê kev bibî seyran û geşt û mehrecanî
Ferat û dicle û xabûr hemî rabin bibin yek
Serî hildin bidin pêla dema ku tên ji banî
Keç û xort û jin û mêr tev werin cejna welat e
Bi şal û şapikên rengîn bi xemla zer mîtanî
Bi kolosên kevej kal werne govend û semayê
Belê hûn pîre jin tev bên bi şe’rê kesrewanî
Bi hayhay û lîrandin li şûn deran li dar xin
Bi dahol û bi zirna reqs û govendek milanî
Li ser pozê neyaran em bigêrin reqs û dîlan
Felek xayiz bimînî ew di çerxa asîmanî
Ji bajar û welatan bêne cejna serxwebûnê
Bila ew qenc bizanin kurd ne bê nav û nîşanî
Xwedî tac û sera bûn lê felek çavê birje

Xwedî tarîx û tore ew ne bê zar û zimanî
Gelo nayête bîrê dewleta merwan û botan
Kerîm xanê bi tac û al û şahê erdelanî
Bela xweş bête bîrê dewlta koşan û mîtan
Ji berya çar hezar sal paytextê aşokanî
Felek dewrek qirêj lîstî li ser mafê me kurda
Dem û dewr û zeman îro birastî dan xuyanî
Zeman dost çivir îro werin kar û xebatê
Tucar yefşê nedin pîsa bese jar û nezanî
Divê tilya neyar êdî di nav med ew nelîzî
Ji kok bê jêkirin îro bi şûrê qehermanî
Silavên min li ser canê şehîd û pakrewana
Li kevrê ber serê leyla li ser wî ruh û canî
Silavê mi’l şewityê şehrê xormal û helebçe
Li zêwa û li gora her egîd û pehlewanî
Silavên min li pêşmerge li wan box û berana
Dikin gorî ji bo jîna welat umrê ciwanî
Divê em ha ji xwe kin her dem şiyar bin gav û se’et
Bese êdî heya vir ey tîrêjê torevanî.

Berzanî hat welêt

Bi mizgîn û bi xêr hatin welat idrîs û berzanî
Li kurdistan we ruhnî kir ji erd heta bi wî banî
Ji eşq û rondikan çavên di me aryan bi kul bûnê
Belê dîna we şahbazan ji bo çavên me dermanî
Ji eyranê we koç bar kir delava bûn birê keftin
Bi koçê re teba bûn hin heval û dostên eyranî
Welat bêrya we kir bû ey gelîxweş mêr û gernasa
We koç danîbû kêlîkê li bajarê merîwanî
Di wê rojê nema bû kes li gund û şehr û bajara
Digel baqêd gulê rengîn li ser laşê we gel danî
Bi bawer xazin û ridwan ketin baxê buhuştê ew
Milet ket ber silavê tev bi geşt û kêf û seyranî
Keç û xort û jin û mêr tev bigêrin reqs û govenda
Serê pîs û nedilxwaza bigorî û bi qurbanî
Di nîva pek û dîlanê ji wî cî koç birêkeftî
Di nêv bax û gulîstanan li qunaxa duem danî
Ji çar goşê welat milet dihatin pêşiya koçê
Dibû kêf û xweş û şahî li bajarê silêmanî
Bi mest û tor û serxûzî teva dest dane ser hevdû
Ji bona serbilindê kurd serokê û şahê berzanî
Mexabin ku çiqa îro di vê komê dinêrim ez
Di meydanî de nabînim şêx mehmûdê zirav kanî?

Xudanê xincera zîvî pilngê çayê sordaşê
Şoreşgêrê bi nav û bi deng li berdê hehreman kanî?
Bi canbêzariya dev teng li pêşya cengevanên kurd
Di cenga leşkerê feysel kumandosên birîtanî
Çi kevrê çayê sordaşê sipî wek mermer û almas
Ji xwîna canfida bi rengê sor û mircanî
Bela romê teres her dem bi malkambax û wêran be
Nehatî ew dihanê da tu soz û bext bi cî anî
Ji wî cî koç birêkeftî bi sê qunax û sê wara
Li paytextê hewlêrê li kelha somerî danî
Qiyamet radibû dîsa li koh û deşt û topraxa
Bi şal û şapikên rengîn bi xeml û xêzê bukanî
Gelo sersal û newroz e weyaxod mehrecane ev
Li her cî reqs û dîlane li ser tilya bi şêxanî
Li alîkî xweş û kêf e bi dîna qehremanên kurd
Li ya dî qîr û hawar e girî û şîn û fîxanî
Cegerxîn û hejar û ehmedê namî serî rakin
Bidin ber şir û helbestan bi kurmancî bi soranî
Ku ev roja weye îro kefen bavên ji gorînê
Di vê rojê de dilxweş bin nemînin dil bi kovanî
Du malbatên bi nav û deng ji dewra bav û bapîra
Gelek zor û setem dîtin Bedirxanî û Barzanî
Di meydana şer û cengê wekî rustem kurê zal bûn
Xwe nespartin neyaran qet xwe nefrotin bi erzanî

Ewin taca serê kurda li her çax û zemanî da
Heya bilbil di baxan da bixwînin û bizên kanî
Ji wî koç bi bala ket li çar goşê welat gerya
Bi navê dewlweta kurdî gelek şabûn bi rêzanî
Gelo koç geşteya Nûh e çiya tev da serî hildan
Metîn û zozik û şingal sefîn û cerdê seywanî
Ji gelyê laleş û şêxan heya bighêje hemrînê
Tuxûmê şax û şeqlawe bighêje sîrwanî
Ji çayê gerdemend heta ku bighêje helafurdê
Çiyayê bext û ertûşê heya bigêje germiyanî
Omîda her çiya ev bû ku ew koç bê li ser deynî
Bibî fexr û ziyaretgeha bi gora şahê Berzanî
Di çar qûnaxê dawî de berê koçê xwe da berzan
Li warê bav û bapîran li quntara çiyê danî
Bipêçin qehremanên kurd bi ala kesk û sor û zer
Bila razên xwea şêrîn pîroz û raheta canî
Bila axa welat herduwa di ber sînga xwe himbêz ke
Ew e dayka me ya dawî henûn û pir dilovanî
Li ser axa welat paldin ku dîbac û hevirmêş e
Wekî hilma şimamoka gulav û misk û rîhanî
Çiqasî ku bibêjin ez bi dev xamê timî kêm e
Emê bispêrin tarîxê bela bêje bi wicdanî
Ne mir ye saxe berzanî di nêv cerg û dilê kurda
Hezar rehmet ji dev tîrêj li ser wan be yezdanî.

Ez û felek

<u>Seyda</u>:
Felek zalim bi mer êdî çi doze
Di îşê ted xeber nadî tu xam e
Bi mer herdem bi kîn û bi poze
Li dunyayê tu bû qîr û bela me
<u>Felek</u>:
Ez im çerx û felek her wek tu zanî
Di destê min de dûlaba cîhanî
Çi milet ku li ber min desthilanî
Li dunyayê geda û bê geram e
<u>Seyda</u>:
Ez im bê şek kurê guhderz û kawa
Kurê Rustem kurê Xesro û Cemşîd
Li ber te ez tucar ser natewînim
Firaz û serbilindî ‘adeta me
<u>Felek</u>:
Heya wa bî ewê halê te ev bî
Tu naghêjî tu daxwaz û mirada
Bizan kîna min pir dijwar e kurdo

Gelek wek te xwe davên ber siya me
Seyda:
Bi kêmasî tucar nayême rayê
Me pir şerme ji wan box û berane
Ezê çawa serî hildim bi qelsî
Li ber tarîxê kanî bersiva me
Felek:
Tu bawer be ez im dîrok û tarîx
Ez im qheremanê çerxê gerdûn
Timî rojê dişînim ber bi ava
Dikim tarî li yê nakî bi ya me
Seyda:
Xwedî mafim ne wek te xûz û xwarim
Ku ew mafê bi destê te mi navê
Heqî zor e qelen gorî û xwîn e
Ezê bînim bi gurz û şûr û qam e

Felek:
Gelo najo serê hespê xwe nagir
Li çar hawîr tu binêre ey tu kurdo
Neyarin tev bi tang û top û leşker
Mecal teng e û meydan ber qiyamê
Seyda:
Werîn bîra xwe aşûr û sikender

Ewan salyan dişandin textê dara
Ez im nevyê ewan gernas ê mêra
Ez im şevgêr li hevrazê çiya me
Felek:
Di kurdistan de çar sînor me danî
Xwedî min kir biyanî têde îro
Di nêv xaka xwe de bê pişk û pare
Tu tê de wek xerîbê misr ê şam e
Seyda:
Wê rojek bê ku şîrora hilînin
Wê çar perçê welat dîsa bibn yek
Eger ku ez nekim hinga ne kurdim
Ne xurdê şewket û tac û sera me
Felek:
Gelek pesnê xwe med êdî li ber min
Bi te çavê mi qet bar nabi kurdo
Li meydanê emê hevdû bibînin
Kiye axa ji me kîja xulame
Seyda:
Pesindîdim ji dewra bav û kala
Ku bapîrê min deng dabûn cîhanê
Ji bîr mek imapratora mîtanî
Weîn bîra xwe mîdya dewleta me
Felek:

Nekev kir min tu gelkî şaşe kurdo
Wekî dojim ter û hişk ez disojim
Ez im bager ez im bahoz û serma
Ku serdar û şehê roj û şeva me
<u>Seyda</u>:
Bila l'enya te bî ev şerm û ev ar
Li jor e tim tu qet nayête zeftê
Bi xwîna te tucar tihna mi naşkê
Hênik nabî li dunyayê kela me
<u>Felek</u>:
Ji ber şûrêm xwe bid alîkî kurdo
Gelek tûj e me avdaye bi jehrê
Li kê dim ew birîn lê nabe derman
Ez im jana zirav ez êş û ta me
<u>Seyda</u>:
Di destê min de şûrê rustemê zal
Di destê dê de mertal ji pola
Siwarê hespê rehwanî kumêtim
Di meydanê de rengê birq û ba me
<u>Felek</u>:
Xelas nabî ji destê min tu kurdo
Eger vêga tu bighêje sitêra
Cîhan wekî tara bêjine li ber min
Li ber çavê min tim dorbîn û cam e

Felek:
Tu destê xwe bi destê min îro
Nifir bê fêdene kurdê dilawer
Gelek milet ji diyê berze bûne
Hemî qir bûn dijî şop û riya me
Seyda:
Di dunyê de qir nabin tucarî
Di tarîxê de pir koka mi kûre
Gelek dewr û demên dijwar mi dîtin
Tu xweş zanî venemrî ew çira me
Felek:
Gelek wek te me kir jar û belengaz
Gelek min ew kirin paşa û serzar
Di cîna de mij û moran û tozim
Di cîna de wekî baxê gula me
Seyda:
Li hember te wekî şêra bimînim
Ji te bêbawerim her dem ne dostê
Tucar darê xwe danînim bi dîlî
Te dil xweşyek li dunyayê ne da me
Felek:
Çiqas sertî dil û gurçik ji pola
Yeqîn pola tucar naxwî ji pola
Bese êdî kezeb me l’hevdû reş kir

Li gor fikra xwe her yek berdewame
Seyda:
Tu bawer be li ser mafê xwe ser tim
Ne kêm im ez xwedî tarîx û torim
Gelek şerme ku ez darê xwe deynim
Bi goriya hêtirê çavê diya me
Felek:
Bi ya min bik bi dahola demê re
Serê govendê bigir û pî li ba ke
Tu dê bighêje daxwaza xwe kurdo
Bi soz êdî zirar nayê ji ba me
Seda:
Ji xortên dilşewat ez bendewarim
Bi zanîn û bi xwendin bên xebatê
Wekê tîrêj dibê tev de bibin yek
Bi bişkêvin ji xarê sorgula me.

Kela xwînê

Çi ferman û çi talan e delalê nazikê bozê
Tu pêxwas û perîşan e di nîva berf û bahozê
Gumîna ewr û tava ye ku ba berfê ditozîn e
Birûsk û birq ji her alî vedidne şev wekî rozê
Mij û mûran û serma ye der û rê tev de windane
Gurê qafê çiya d'zûrin ji birçîna ji alûzê
Ji hêla dî neyar tême ji jor agir dibarînî
Li erda gurgura topan xumîna wê meteryozê
Tu derketiya welat e keç biçûkê hê tu hef salî
Ji kerkûk ya ji şeqlawe ji zaxo ya rewandozê
Di vê koma giran xuşkê te dêw bavê xwe winda kir
Wekî qefla gelê ermen li zozanê alagozê
Li dû qeflê bi kulkul tê bi hawar û bi qêrîn e
Xem û derdê mi tev rakir te ey berxa devê kozê
Gelek heyfa mi tê rindê tu van hêsran dibarînî
Ji çavên reşbelek îîro bi cogan têne ber pozê
Dem û dewran bi dijwarî li me geryane çep dîsa
Were rûnê li kulîna mi îro ey tu feyrûzê
Te rahêjim li ser milkim di nîva ceger û dil kim
Delalam west û têlaye tebighînin belakozê
Biçûk û nifşê nûhatî omîd û remz û nîşanin
Kela xwînê me hiltînî ji bo vê riya dozê

Li te mizgîn bi hikmê dem di pê tenga firahîne
Welat wê serfiraz be ez didim te her evê sozê
Ji tîrêj xweş tu bawer be ne dûr tê bê welat dîsa
Bi dêw bavê xwe tê şabî wekî sersal û newrozê
Çi gunhê vê ye ma çerxa felek ey kuç qulipyê bes
Hewar êdî ji destê te genîkê xwarê tim xûzê.

ji bona boneya meşext bona kurdên başûr ev helbest min bivî rengî hûnandiye. Her wekî ez jî bi wan re meşextbû me û bi keçek heft salî re dipeyvim.

Nezanî derdekî zor e

Bese cilka xewê bavê li te şerme tu razabî
Bizane ku cîhan dewre divê herdem tu pê rabî
Şev û roj tim wek hev nayên cih û warê xwe dughêzin
Di vî çax û zemanî de divê pespor û zana bî
Ji kerwanê dem û wextê nemîne tu li paş kurdo
Bi hêvî û bi lavlava ewê heqê te winda bî
Bi ilm û xwendin û zanîn divê pişta xwe bijdînî
Bi kona re bidî û bistîn ne yê sîwak û werda bî
Dema kar û xebatê ye xwe med alîkî dem seyde
Bela para te ya şêr be ne ya wawîk û hirça bî
Heq û edalet xurtî ye ji mêj ve hatî ye gotin
Destûra enûşêrwan di qanûna hemorabî
Nezanî derdekî zore xebat tev pûç û vala ye
Bi kawikî nezanî tê şivanê kar û berxa bî
Evê êşa sedê sala nekî derman bi zanînê
Di bin destê neyara de tu dêreswa û kola bî
Tiving û xame ku herdû li meydanê nebin hem dem
Tu naghêjî tu armanca eger gurçik ji pola bî
Welat keç am û dotmame bilind û çav reş û rinde
Divê îro di meydanê wekî xesro û kawa bî
Kum û kolos li ber linga nedî erdê bi gernasî

Ne parêzî ji xwînxwara bi sîngê gewr tu şa na bî
Bira tîrêj bi dil xwazî didî ber te riya jînê
Welat doje eger têde ne serbest û ne aza bî
Bi hêvî me ku şi’ra min ji ter îro bibî dersek
Nebî xurdê çira kwîra ne bilûra li ber ga bî.

Xewna min û bersiva cegerxwîn

Rojek ji yê buharê bîst û yekê adarê
Ez ji kara westiyabûm ji roj ava raza bûm
Xwenek kûr û xulobat bi ser çavê min de hat
Di xwê de min dîbû dinya yek ser tarî bû
Gumîn ji tav û ewran dihat kiser kurdistan
Bi birûsk û ar û pêt dê dergûşa xwe davêt
Min dî xoretkî bedew bi dest û pê û qelew
Şipya li ser textebend li me gotarek dixwend
Bakî gûr hat wî bayî ewr firikand bû sayî
Mi pir çep dikutand bijî bijî kurdistan
Ey seydayê cegerxwîn me’na xwena min
bişîn
Çav li rê me dem û gav
ji tîrêj li te silav

Sed xwelî li wî serî

Ez bi zarokî ciwanî bûm evîndarî welat
Şev û rojan dil fekar bûm mame xemxwarê welat
Suxtiyê seyda cegerxwînê mezin bûm bê guman
Ez li ser şop û riya ketme ser rêça welat
Pir di vê rê da me dî girtin û lêdan û setem
Lê çiqa xweş bû bi min ew tevger û karê welat
Ez ne daxwaz bûmji bo malê dinê çavê di reş
Destegîr bûm ez di gel jar û sitûxwarê welat
Xameya min şûrê tazî bû di dest min her demê
Tim bi êrîş bûm li ser pîs û sitemkarê welat
Ez di gel xemla buharê bûm kulîlkêd renge reng
Ez di del koçer û êl û pez û dewarê welat
Rêwiyê çol û çiya bûm hemdemê hov û teba
Hem neşînê keç û xort û kal û kevnarê welat
Ez di gel dahol û zirna bûm govend û sema
Dengê tenbûr û bilûra wan mûsîqarê welat
Ez di gel kom û civat û şevbuhêrkê kurd re bûm
Serpêhatî û stran û pîr yextiyarê welat
Rengê goyînê fîxan bûm li ser canê şehîd
Qehreman û pakrewan û canfîdakarê welat
Me ji yezdanê dilovan her dem û caran dixwest
Go bijîm sed sale dî der xizmet û karê welat

Lê mixabin ez çi bêjim feleka malik xerab
Wê min dûr ke ew ji gera çerxa destarê welat
Ger ku çend pirtûk û dîwane ji bo milet me hişt
Têr nebûm dîsa ji pesnê neqş û nîgarê welat
Her wekî tîrêj dibêje sed xwelî li wî serî
yê ji milet dûrkeve ma ew gunehkarê welat
min bi hêvî ji te milet gazina te ji min nebî
di bi hisret herme gorê mame deyndarê welat.

Berzanî ne mir ye

Ji mêj ve min dixwest mesûd bibînim
Omîda min bi cî hat wek min xwestî
Ne ku xwen û xeyale ez dibînim
Dizanim dîtenk rast û durustî

Di wê enya te ya wek mûm û fener
Kilîşa kurdistanê ez dibînim
Dibînim serhed û sîpan û bîngol
Cezîra kurd bi wê rewşa xuristî

Dibînim dêrsim û çiyayê elî beg
Ferat û dicle û xabûr dibînim
Dibînim wan rez û baxan seraser
Bi bawer û yeqîn ey gelperestî

Neyar vêga bi sê teşya dirêsî
Li ser mafê me go tevnê li darxin
Dikî nakî bi destê wî ve nayê
Hevokê me ne xêwî xav û sistî

Çira k vêketî b’destê we îro
Li kurdistan bi xwîna pakrewana

Di xwazî wê çirê vemrînî dijmin
Venamre ew li ber şûrê ji hestî

Xuyaye pir bi lerz û taye dijmin
Ji govenda li erdê sedamî gerya
Ditirse ew ku roj bê ji rojan
li ber deryê wî ew govend bibestî

bijî herdem kurê şêrê li berzan
serok û serbilndê qehreman
serekdar mezin pêşwa û serkêş
nemir yê ew di xweda ye nivistî

ne mir ye mistefa berzanî saxe
bijî her dem di nîva can û dil da
bi kêmasî me ev helbest danî
mixabin ku serê xamê şikestî

çi bêjim di heqê wî de kême
emê bipêrin dîroka cîhanê
bela tarîx di heqê wî de bêje
bi wijdan ey tîrêjê dûredestî.

Pakrewan

Pakrewan mûm û çira ne di şevên tarî û reş
Wan ji bîr qet neke tarîx pê dibî ruhnî û geş
Wan bi xwîna ercewanî qad seraser kirne sor
Têrkirin dara jiyanê şîn vebû her cî û dor
Bûye tev mêrg û gulîstan ji kulîlkêd renge reng
Kesk û sor û zer dixwînin remz û nîşan bi deng
Wan hêvistîne ji rengê wan gula ala welat
Hate hilda ew di nîva kurdistana rojgilat
Wê ji ser me wergerandî tirs û lerza zorkera
Lê didî ba serfiraze ew li ser xan û sera
Sûnd û peyman bi birûska devê atêşa şehîd
Sûnd bi ala me ya rengîn zendê gernas û egîd
Sûnd dixwn em bi çiya û deşt û zozanêd bilind
Bi newal û mêrg û baxan kavilên bajar û gund
Sûnd bi kenê ser dev û biçûkê bê guneh
Sûnd bi girtiyên hebs û zindanan ewên dersal û meh
Sûnd bi xwîna wan şehîdan sûnd bi zor û setemê
Emê heyfa wan hilînin bi tiving û qelemê
Her wekî tîrêj dibê firset ku hat yefşê medê
Ger di wextê neçin cot naghêjin sersedê.

Siwarê dînasor

Ta hebem ez li dinê terka te nakin bi xwedê
Sar kirî destê min îro te her kar û kedê
Şev û rojan ez di tatûla te da me ey welat
Lê bi hêvî û lava naghêjim meqsedê
Haletê min her demê dişkê zevî maye beyar
Nêvçeye cotê mi latê naghînim ser sedê
Ketme ber çerx û zemanan ew heyamên kûr û dûr
Nîçîrvanê pez û kovî bûm ji dewra cemedê
Herdû qubbên jor û jêr berya ji hev bi ew cuda
Ez siwarê dînasor bûm li welatê serhedê
Qelzem li deryayê hind behra reş û sor û sipî
Hê ku yek bûn keleşî mi dikir li çola amedê
Agirêm gur bû li zaxros û ararat û metîn
Qehremanê textê kardox bûm li qafê kombedê
Lê çikim dewra min çû ez ketme bin destê neyar
Feleka malik xerab nadî min carek mededê
Ez belengaz û reben mame di vê dewra cîhan
Bê heval û hogirim wek sêwiyê bê bav û dê
Va bi xaza xerdela ez tême sotim bê sebeb
Kes li min naoirsî carek bûme wek guriyê qedê
Lê bizan firset ji zêre her demê nayête dest
Gog dema bê ber bi kaşo lêxe qet yevşê nedê

Tazî û eyran û tirk xêra welatê min dixwn
Bê welat tê çibki tîrêj can bi comerdî bidê.

Ez û bilbil

Sorgul di baxan bkivin
Mizgîn li bilbil bû buhar
Çendik didan dora gulê
Şebnem li ser xuncê vexwar
Ew badeya şêrîn li ber
Xweş lê dibû şîr û şeker
Sewda mejî avête ser
Cîhan li ber bû tar û bar
Ew bade bû lê wek zirav
Sor bûn li wî qapax û çav
Serxweş ketî ber wext û gav
Rondik ji çavan têne xwar
Rondik li pê hev bone cok
Rabû li ser yara xwe got
Cerg û dilê min tev disot
Min got wî murxê hejar
Besbes bike fîxan û deng
Te l'xwe şikandin bask û çeng
Avête dil min dest xudeng
Derd û kulêm nayên jimar
Megrî gelek wek te hene
Derdê mi jê wek yê tene

Şîn û girî bê sude ne
Qed fêde nakî zarezar
Bextê te yê reş wek tenî
Her dem bi lewm û gazinî
Tu bilbilê baxê minî
Wer da bibin em dost û yar
Ev derd û êşên ku hene
Ma qey timî para mene
Yan em li dinê zêdenê
Qirbûn li ser me bû qerar
Destê xwe bid min ez benî
Xweş hemdemê renga minî
Îro li vê dewra genî
Destê me nînin tev neyar
Carek li hev rûnên hema
Ber kanî û av û çema
Derkin ji dil derd û xema
Seyran bikin em war bi war
Me erd û ezmanek hebû
Cê bav û bapîrê me bû
Bosteke dijmin tê nebû
Va bûye ew çar pişk û par
Raste erê em têdene
Reswa û bend û kolene

Bin destê neyarê xwene
Hin girtî û hin jî ferar
Kurd heft hezar sal ew hebûn
Gernasê ser xaka xwe bûn
Kardox pêşiyê me bûn
Mîtan û mîd û şehsiwar
Ta em nebin yek wek bira
Nabin xwedî tac û sera
Dijmin wekî hirç û gura
Me ji hev dikin sed perç û par
Tim hêviya tîrêje ev
Destê biratiyê bidne hev
Rojê li dijmin bikne şev
Rizgar bikin herçar kenar
Ey bilbilê mest û hezîn
Hinga li me tê hev birîn
Pir xweş dibin işq û evîn
Der tên ji dil ev pêt û ar.

Kabûsê mirinê

Ez pîr û kal bûm dewra min nema
Ketim ber pêlê derda û xema
Werzê mi lê bû tişrîn û kanûn
Kulîlkêm weşyan ji şaxê lema

Jîna ciwanî pişta xwe da min
Lerz û êş û ta ketin laşê min
Kabûsê mirnê berê xwe da min
Bi kerb û bi kîn nizanim çima

Kabûsê mirnê sawêrek bi tirs
Rûyekî pir tal bê bersiv û pirs
Xwe gal kire min qelafetê girs
Ji piyan ketim çara mi nema

Ji hêz diketin dest û gavê min
Rewrewk digirtin herdû çavê min
Xetek sor kişand li ber navê min
Porê min bû kak bi tena xwe ma

Nîşana mirinê ew bû xeta sor
Kort û lod û çal li min dibûn gor

Me tiştek nekir ji bo riya dûr
Ne bîrewer bûm di çax û dema

Çax û demê min tev çûne vala
Lîsk û laqirdî gera nav mala
Li cem metik û xaltîk û xala
Reqs û govend û dîlan û sema

Ketin ber bayê feleka cado
Mi tu ked nekir dema mi da dû
Tiştê ku min dîn çûn wek roja do
Bûn wek fêlimek ji yê sînema

Rojekê ji rojan ev gewd kalax
Wê tev birizin wê tev bibn ax
Dibe axa min bikin weke axa
Ku jê çêbikn lat û senema

Yan jê çêbkin kop û peyala
Tijî baedken ji rengê ala
Têkevî destê şah û qerala
Nav dev û lêvên naz û xanima

Yan jî biçînin tê çîçek û gul
Li ser bixwînin şalûr û bilbil
Yan bikin derman ji bo çavê kul
Ku bê firotin ew bi derhema

Ew axa mayî bighînin laleş
Têda biçînin şitla gulek geş
Eger wa nekin bextê mi ma reş
Te ‘bikro tîrêj te’ba te b’tema.

Ez û tûtin

Seyda:
Tûtinê xweş tûtinê
Lê hevalek xayinê
Tu neyar û dijminî
Sebeba êşa minî
Tûtin:
Ez tûtina şingalim
Por zer û birî çalim
Ez xweş dost û hevailm
Bawer bike ez benî
Seyda:
Tevde tu êş û jane
Derdekî bê dermane
Nexweşya dil û cane
Ta'le tu jehr û genî
Tûtin:
Ez im tûyina silîva
Di nîva dev û lêva
Piştî taştê û şîva
Tu bi kedera minî
Seyda:
Ez nexweşim bê halim

Şev û roja dinalim
Tev ji destê zalim
Bi aqlê midkenî
Tûtin:
Tûtina mûş û wanê
Ez im li kurdistanê
Min deng daye cîhanê
Bêhna xweş ew ya minê
Seyda:
Bê bawerê zik reşê
Tu wek tûmê kelbeşê
Dinya gewrik rûreşê
Li min dikî wek tenî

Tûtin:
Tûtina xursa navê
Ez im li ber wê avê
Zer xuya me ber tavê
Qlûn vexur mid cinî
Seyda:
Xapînokê ne waye
Hevala êş û ta ye
Xefk li ber min veda ye
Tu melkemota minî

Tûtin:
Her hilmekê dikşînî
Agir bi min di xînî
Hezar kulî dertînî
Mirna te b’ destê minî
Seyda:
Tîrêj bi soz berê
Wê te bavê defterê
Ferman bikî j’vê derê
Beherke kûr bê binî.

Mişk û pisîk

Pisîk hat ber derê mişk
Bi girî û bi fişfişk
Ser bi şaş û çav li jêr
Go êvara te bi xêr
Fermo carek were der
Bidim te zêrekî zer
Bi xwedanê roj û şev
Xêra bavê mine ev
Em malek dewlemendin
Çav fireh û comerdin
Mişk bi aqlê wî kenî
Paşê gotê ez benî
Rê ne dûre bigrim ser
Ne hindike zêrê zer
Ey teresê çav li jêr
Kengî tu bûyî camêr
Ti bê soz û bawerî
Xwe bid alî ji ber derî
Ser bi şaş û bi kofî
Kengî tu bûyî sofî
Go rih bibi sê buhost
Dijmin tucar nabi dost

Tîrêj dibê mêr û jin
Nebin bawer bi dijmin.

Şi’ra melê kurd

Tîrêjo tu tîrêjek ji roja vî welatî
Her dem bi xebat
Dildar û evîndarî li pê roja featlî
Dil nîne tebatî
Şûn mayê cegerxwînî tu vedixwînî dinalî
Vî alî û wî alî
Dil sade evîn e şev û rojan her bi karî
Wek hacî û nacî
Seydayê berêz xortên welat van e li karin
Manende hejar in
Ristên te yî şêrîn bi xwe ew pêtê welatin
Ser rêka xebatê
Tîpê go ji qendîlê welat daket û hat
Mizgîna felatim
Helbestî hilo ew bi xwe ermûşê herînin
Yan şerbet û şîrin
Lê gava dibarin ser neyar wek ber û tîrin
Hingî bi tesîrin
Tîrêj ne bêjem ne jî ustaz û ne rêber
Lê dil bûye perwer
Feryade ji bo roja welat ew kengî bê der
Ta ku biçî pêş der

Pêşmergê çiya vane ketin nav ber û nav lat
Xweş hatiye şapat
Mizgîne li henber bû li zaxros û ararat
Va roja felat hat.

Bersiva şi'ra melê kurd

Melê kurd ey birader peyama te ji mir hat
Pir buhaye li nik min tev mizgîn û tev xelat
Te kirim bi rêza hejar û hem cegerxwîn
Gelek girane ev bar wek çiyayê ararat
Ev qîmetê te da min pir zêdî hunera min
Neşim dibin de rabin girane barê welat
Riya welat ne doze kelem û berf û kaşe
Ne raxistî' b kulîlka tev hîm û teht û kelat
Divê em dest bidin hev bi yekîtî tevayî
Em rê nedin qirêja dijî rizgar û felat
Ev welatê xweş û rind em anîne cîhanê
Xêr û bêr wê dixun ava bi gol û ferat
Dema em canfida kin ew dayka dilovan
Sînga xwe vedqelêşî himbêz dikî me 'b şewat
ev cîana ku em tê warê piling û şêre
tevger û berxwedane tev ked û kar û xebat
divê ku em xwe têxin warê piling û şêra
ne wek rovî û çeqel hestî kujêd bê xelat
yê ranebe dozê poşman û ser bi xware
wekî tîrêj dibêje: roja med go vaye hat
pir bi kêf û spasim ji te melayê hêja
bi wî rengê teyî xweş qebqebq dengê rebat.

Tu ji tarîxê bipirse

Tu ji tarîxê bipirse ew dizane kîne em
Em ji pişta qehremanin keyxesrewê mîdî ne
Henber aşûr li babil paytextê dewletê
Destgîrê hemûrabî şahê kildanîne em
Em ji afet kurê nûh in pêş û salarê kelek
Em ji cûdî daketin xwar hinû ewripîne em
Nevyê rustem kurê zalê û guhderzin hemî
Dijminê efrasiyab paşiyê toranî ne em
Kurê kawa yê hesin kar serbilind û qehreman
Mêrkujê dehakê zalim miletê arî ne em
Nevyê koşanin qerpalê paytextê aşokan
Navbera dicle û ferat kurdê mîtanî ne em
Dewleta siltan selahedîn paytextê misr û şam
Leşkerê azadiyê şûnwarê eyyûbî ne em
Em ji meya fareqînin leşkerê bazê leheng
Canfidayê paytextê şahê merwanîne em
Ebdullê nehrî dema ku şêst hezar leşker civand
Kurdê zaxrosim bi xwe tev leşkerê nehrî ne em
Mîr Beder Xanê Cezîrî hakimê Birca Belek
Xwendekarê dewletê pêk ve sîpahê wîne em
Em ji amed bi xwe pêşmergê cenabê Şêx Seîd

Li ararat leşkerê Ihsan kurê Nûrî em
Li Şikak leşkerê Simko kurê cewher begin
Lê li Sordaşe peyê Mehmûdê Berzencî em
Leşkerê Seyid Riza em bûn li çiyayê dêrsimê
Qehremanê Şêr Elî tev canfidayê wîne em
Xayinê rêber hevalê dijminê tirkê teres
Lê biroska devê artêşa di dest besê ne em
Şoreşa Qadî Mihemed li Mehabad vêket
Leşker û pêşmergê pêşwayê mezin Qazî ne em
Jê bilî destê Riza xan ew Şehinşahê ecem
Daye sê dara serê Qadî bi derdê wî ne em
Şoreşa berzanî rakir li Kurdistana Iraq
Tev sîpah û leşker û pêşmergê Berzanîne em
Em bi dest rast û çepa va tên firotin dem bi dem
Tev firarê ser çiya ne girtî û xwînîne em
Ma gelo hov û teba ne em li ser xaka cîhan
Têne cenga me ji çar alî de bê hêvî ne em
Tim bi halan têne ser me tazî û tirk û ecem
Ew ji cê me derdixin ma qey bira bê cî ne em
Ey civata mileta dengê me çû çerxa felek
Hûn ne lal û ker û kêjin qey nizanin kîne em
Ey tîrêjê dil bi kovan bese dîwar bi guhin
Kî dixwînî û guh didî şi’rê te hê sofî ne em.

Welatê min

Çiqa bêjim tu şêrînî welatê min
Ti xêr û bêr û mizgînî welatê min
Hemî bax û rez û dehl û gulîzarin
Buharek têr gul û şînî welatê min
Kulîlk û çîçek û nêrgiz gul û beybûn
Xwe pê her dem dixemlînî welatê min
Refê teyr û tilûra têne seyranê
Tenê bilbil bi nalînî welatê min
Ni hesret sorgula bînok dikî himbêz
Li ser hêsra dibarînî welatê min
Dilopa ser devê xuncan dinoşî ew
Ji lewra serxweş û dînim welatê min
Çiya û deşt û zozan û çîmengahin
Bi ava xwe tu zengînî welatê min
Ji hevrazê çiya dertên çem û kanî
Çemê xabûr bilez tînî welatê min
Ferat û dicle ava çemê hêzl
Di bin cengê xwe dertînî welatê min
Bi çaviyên ku ji tehtan têne xwer herdem
Tu pê têhna me dişkînî welatê min
Sura bayê siba bihna gul û sêva
Ji zozana bi xwer tînî welatê min

Ji qada te dur û elmas û cewher tên
Ji çar hêla diçirsînî welatê min
Buhiştek heq diyarî daye gerdûnê
Bi rewşa mah û perwînî welatê min
Tenê gavek ji zozanê şerefdînê
Buhayê çîn û maçînî welatê min
Di nêv xaka te neft û komir û hesin
Tu pê diyê dihejînî welatê min
Çiqa penê te ez bêjim ti hêjayî
Tu dayik û tu dayînî welatê min
Ji pêsîrê te vedxum zemzem û kewser
Tu cî û war û hêlînî welatê min
Mexabin ku ji destê xayinê milet
Kul û derda dikêşînî welatê min
Şêrê berzan ne mirye kesê xayin
Ji qada te bi dertînî welatê min
Ne pir dûre ku kurdistan bi ser xwev bê
Tu dîroka mem û zînî welatê min
Eger tîrêj şev û rojan dikî gazî
Li ser tim dilo dînî welatê min.

Şêrê kurdustan

Di hezar û neh sed û not û şeşa heftê gulan
Li cizîrê bûye şahî navbera dicale û ferat
Ro ji hewlêr bi derket paytextê dewletê
Şewqê da bajarê qamişlo yeker bûka welat
Bû li çar koşê cizîrê kêf û seyran û xweşî
Pir bi mizgînî serok mes'ûd kurê berzanî hat
Bi hezaran keç û xort û jin û mêr çûn pêşyê
Tev diketne ber silavê şêrê kurdistanê hat
Lîrlîra keç û qîza li çep û rastê riyê
Gumguma dahol û zirna reqs û govend û civat
Berê teksiya xwe da qamişlo serdarê bilind
Pêrgî hatin miletê kurd kom bi kom qed bi qed
Şehrê qamişlo sersar bşye lê kêf û xweşî
Bûye lê sersal û newroz çûne kanûn û sibat
Wa ji nû deşta cizîrê bûye lê mêrg û buhar
Bi kulîlka xemilî ew gund û bajar û kelat
Bilbil û şalûr li yek hawî dixwînin dem bi dem
Tê li ser teht û şikêra qebqeba dengê ribat
Bûye mêvanê hecî ebdilezîz bavê ehmed
Kûrê hacî xelefê sara çi kurdin dilşewat
Keç û xort malê derkeftin dihatin pêşiyê
Dane ber çepkan ji bona rêberê kar û xebat

Ser ser û çavan tu hatî kurê berzaniyê nemir
Ey xudawend û serokê partiya demoqrat
Dil û malê me li ber te tim vekir ye pêşewa
Rengê heyva çardehê îro li Qamişlo hilat
Bav û bapîrên te pêkve bûn şehîd û pakrewan
Can di meydana şeref de xweş firoyin bê mezat
Xemilandin xakî kurdistan bi xwîna sorgulî
Ma ne bes ey çerxê gerdûn xayina kurd bê xelat
Ev çi kîne tu bi mer herdem dikêşî şev û roj
Ey hevala dijmina wey olperesta pût û lat
Deşt û zozanên me toq bûne ji xwîna kuştiya
Pakrewana ruhê şêrîn kirne qurbana welat
Sed hezar car aferim ey şêr û gernasê welat
Tev bi mêrxasiya îro va dem û dewra me hat
Çerxa dem herdem li pêşe nagerî ew ber bi paş
Miletê kurd namirî wê herhebî roja feleat
Bayê kurd rabû ji pêşve jevketî koma neyar
Mij û ewrên reş û tarî çûn ji ezmanê welat
Miletê kurd bûne kom dîsa li meydana fireh
Sef bi sef mil dane hevdû bê jimar girtin civat
Hate serban herdû dest hildane pêşwayê mezin
Pir sipasa gel dikir dewra ku pê rabû welat
Xwedî gotarek bi dil sozî li wê koma giran
Tev bi şahî j'ev belabûn piştî da wan ev xelat

Ew şeva pîroz û şahî leyletul qedra me ye
Wê di dil da bî timî tîrêjê bê sebr û tebat.

Çûna bê veger

Eger umrê teyê nuh bê siwarê geşteya ba bî
Ku gustîla te telsem bî li ser textê silaman bî
Bi milk û malê qarûn bî ku textorê te luqman bî
Çiyayê serheda pêkve sersar dar û derman bî
Tu bighê berê perê ezman ji ber mirnê xelas nabî

Tu wek rustem kurê zalê siwarê rexşê rehwan bî
Tu wek keyxesrewê mîdî xudanê tac û eywan bî
Li bajarê silîva tu li paytextê merwan bî
Tu şehsiwarê gerdûn bî bi dest te çerx û dewran bî
Ji deh gaz caw kefen pêve ji dinyayê bi xwe nabî

Tu wek Iskenderê romî bi leq û hêz û leşker bî
Tu wek Cemşîd ku taca te dur û elmas û cewher bî
Bi dûrcana tiliskopî 'eqîq û lal û mermer bî
Cîhan têde xuyabî tev bi dîn û lep û tevger bî
Ne hember se'eta mirnê ji tîrêj xweş tu bawer bî

bi van êş û kul û derdan di nîva lerz û tayê
ku mirna malxirab tê me emê çipkin ji dunyayê
di wê gora reş û tarî di hana me tu kes nayê
li ser xort û ciwanên me de bigrî goyînê dayê

çi çûnek bê veger derdo felek hayê felek hayê

egîd û şêr û gernasên me gotin ka hemû kanîn?
Teva barkir di nêv axa cebana de serî danîn
Ji dunyayê tu zîv û zêr ji dunya dî re hilanîn
Heçî ku çûn nehatin kes ji bo me yek xeber nenîn
Bi wan re çi çê bû qet bi me tiştek ne dan zanîn.

Birê Evînî

Xirqe û bendik

Sehergeh ez ji xwe rabûm sira bayê siba xweş tê
Bi wê xemla hevirmêşî mi dî gewrê ji laleş tê
Di dest de çembilê şerbik ji ava zemzemê têda
Di destê dî guroşka şêx qet û paçik di ber piştê
Bilez ez çûm li ser çogan tewafa gerden û lêva
Mi dest avêtibû şerbik ji dêvla wê rahiştê
Mi zanî şox û şenga min glelek westa û têlaye
Ji çûn û hatina laleş ji seyran û ger û geşte
Mi gotê ser ser û çavan tu hatî rojperesta min
Firişta kaniya berzex kevoka baxê buhiştê
Ku salik dî emê herne meqamê hezretê zerdeşt
Li şehrê qermiya gewrê li yezdê û li serdeştê
Kitêba zendewista ku bibînin da bixwînin em
Emê gelwa ji ezber kin ji bendê mishefa reş tê
Berî da min bi kerb û kîn çi awir wê li min dabû
Ji wan ewrên reş û tarî birosk û birq û ateş tê
Dil û cerg û hinavê min bi yek carî ji hev xistin
Ji mir got ney wefadarî mirîdê şêxê ermiştê
Sîwak û teyles û tizbî di ola med heramin tev
Vege ola xwe ya kevnar ewa kawa û guhreş tê
Bi van peyvên xwe yî şêrîn dixwazî min bixapînî
Bi taûs û bi şêx romî evîna min tu neghiştê

Ji min bawer be tîrêjo tu naghêjî tu daxwazan
Bi wê pûta Anahîta li zaxos raserî deştî
Bi Yezdan û bi Ehrîman bi wî kalê veşirî lo
Bi wan marên şikefta reş ku razane li ser piştê
Heya ku xirqe û bendik nedî bejn û bala xwe
Tu naghêjî tu armancan gelek şaşe tu bê hiş tê
Ewê gavê helesta bûm mi dest avête ser sîngê
Çi bêjî min qebûl kir tev bi soz ringa xwedê hiştê
Li cî min qetik û bendik li gerden xwe girêdabû
Digel xirqê reş û pêsîr li bejna min çiqa xweş tê
Li min negrin gelî xwenda dibêjim lê venapêjim
Ji nîgaşan xeberdar im çi ku bextê mi tim reş tê
Di qanûna evînê de me dildaran guneh nîne
Ji ber ku derdekî zor e ji nîva agirê geş tê
Di govenda evîndaran peyê dîlan û reqsê me
Belê kêfa min hê xweştir li ber tembûr û cembeş tê.

Ne poşmanim

Tucar terka te nakim ez
Ku mirna min li hinber bî
Ku fermana mi diljarî
Ji textê şah û qeyser bî
Ne poşmanim li gerdûnê
Ku min bavêjine hêtûnê
Ji bo çavên te xatûnê
Ku Izraîl li ber der bî
Biborî gurciya mûşê
Ji Bo canê xwe difroşim
Ezê cana ecel nûşim
Li meydanê tu meyger bî
Ji destê dîlber û yarê
Peyalek sade ya jarê
Ezê îç kim bi yek carê
Ji dev reş mar û ejder bî
Ruhê şêrîn bi erzanî
Girawa pertewa canî
Vexum jara silêmanî
Bi min wek avê kewser bî
Ji nîva lerz û tayê

Ji destê zehre sîmayê
Vexum jehrê wekî çayê
Ji çeydan û semawer bî
Di bezma nazik û şenga
Li meydanê bidim çenga
Serî xwarkim li ber linga
Ji mer wek latê azer bî
Bi mestî bêm ji meydanê
Berê govend û dîlanê
Kolos xwarkim li meydanê
Bera mêrik bi rêber bî
Ji kêfa hemdem û yara
Li govenda evîndara

Li mi xweş tê dem û cara
Tîrêj herdem tu serwer bî.

Cam û peyal

Naz û delal minî
Dost û hevala minî
Xwen û xeyala minî
Êmîşê dehla minî
Çav reşê sebra dila
Merhema derd û kula
Sosina baxê gula
Nêrgiz û lala minî
Badeya roj û şeva
Di nîva lêv û deva
Meya me kurda teva
Cam û peyala minî
Kewa li ser kaniyê
Berxa li ber wê miyê
Koviya lat û çiyê
Kara xezala minî
Ser taca xan dimdime
Şoreşgera dêrsime
Leyla keça qaseme
Çar û mecala minî
Vêga ji nişkê ve hat

Roj bû li dinê hilat
Şewqa xwe da ser welat
Mûm û şemala minî
Serbaz û pêşmergeye
Her dem omîda me ye
Tîrêj bi dîna te ye
Beyreq û ala minî.

Heyva li çarde

Bûkê bejn û bala xwe bid ber xemla mîtanî
Bêhna miska û gulavê ji kofiya kesrewanî

Herdû çavên xwe yî reş rinda keşa û bûkan
Bid ber kilê sibhanî gulçîv ji hestiyê çokan

Sîng û berê tazî gewr bid ber hil û mircana
Serxweş bike bê bade pîr û kal û ciwana

Herdû gulên reş bavê ser mil mîna du mara
Biska ji rû vemale bid ber qulpê guhara

Ta ku ruê gewrî boz wekî heyva li çarde
Ji pişt ewran xuya bik tavê li çar kenar be

Tu b'wê bejn û temtêlê perîzadê lewendê
Tena tena bi meş wer hêla reqs û govendê

Bi wa peyvên di şêrîn qendê ji dev brêjîn
Sazbend bi wî dengê xweş li ser bejna te bêje

Dilê zava mehêle heval û dost li dorin

Li kêlekê tu rûnê gustîla pev bugherin

Şeraba kamîranî di wan cam û peyala
Li meydanê bidin dest ciwan û pîr û kala

Bi hêvî me ji yezdan ey bûka ser bi xêlî
Jînek xweş bê kul û derd wej hevdû re bihêlî

Kêf û xweşiya we îro li her cih û derî be
Wek we îro muradê miradxwazan bi cî bê

Tîrêj omîdeware ku ev de'w û doza me
Bi dilxweşî wek îro bi cî be daxwaza me.

Xemla qedîf

Dilber carek were ezê
Deryê dilê xwe ji ter vekim
Ruh û rewan mal û rez
Ted roniya çavê xwe kim

Çavê mi paytextê tebî
Can û ceger nextê tebî
Newroz dem û wextê tebî
Kawa bi pêwanê tekim

Cemşîd di gel taca xwe bî
Cama ji ferfûr pêre bî
Mîdyayê dîwanê tebî
Xesro bi ber devkê tekim

Keyxsrewê mîdî bi him
Rustem bi gurz û şûr û rim
Guhdrez bi şal û şap û kum
Serleşker û hêzê tekim

Ger ku nefertîta berê
Îro ji ihrama derê

Belqîs ji textê kewserê
Tevda bi ferwarê tekim

Zenûbiya nebtî bi fir
Tenha ji tedmir bête vir
Taca ji elmas û bi dur
Ber bazinê destê tekim

Xanim li şi'ra kesrewan
Xemla qedîf û ercewan
Rûnê li textê nexçewan
Baqrof bi qurbana tekim

Şehzadeya rind û şepal
Gerden dirêj û çav xezal
Fikr û xeyala min li bal
Bê wê bi gerdûnê çikim

Cîhan xweşe ew têde bî
Her dem li ser dewra xwe bî
Yê ku nevê bi derdê mi bî
Tîrêj bi kolayê tekim.

Gula zer

Kanî ew buhara şîn ey bilbilê dilawer
Ka ew giya û çîmen ew xunava hûr li ser
Kanî ew pûng û nefel ew kulîlkêd bi deh reng
Bi şev xwe l'hev dipêçan bi roj dibişkivin der
Refê teyr û tilûra vedgevistin bi navê
Geh bi geşt û bi seyrangeh bi ceng û heng bi şer
Ka ew dengê tey zîz bi berbanga siba re
Ka ew ava te vedxwar ji hêsirên gula zer
Wa buhara te hişk bû lê bû germa havînê
Mêrg û kulîlk û giya bûn wek pûş û keramper
Buhar koça xwe barkir çûye zozanê banî
Li wir êla xwe danî ta salek dî bê veger
Tek û têl maye li şûnwara hejaro
Poşmano rabe pey kev tu dê xweş rê bidî ser
Sê qunaxin riya te ey sîpanê xelate
Roja didwa ye bîngol roja sisyaye ew der
Rojê mespêre rojê li ba keve derenge
Bi gotina tîrêj bik tenê nemînî şevder
Bi sistî û bi lava tu kes naghêje dozê
Dosta xwe j'dest xwe bermed nestêleye gula zer
Eger ji min dibrsî kul û derdê evînê

Xem û derdê min zehfin nayên hejmar û defter.

Xama qederê

Ey can lêvên di hevûdû em bidoşin
Der lêvên şeker ava heyatê em binoşin
Emrê me di gerdûnê de çend salin bi hejmar
Ev jîna ku em têdene erzan ne firoşin

Ev jîna ku tê dene tev xwen û xeyal e
Sermayê evîndaran tenê cam û peyal e
Der çola evînê em li rewrewkê siwarên
Ber pêlên di ba bê gem û hefsar em li qoşin

Çogên me di ser nayên di lîskê timî çik tên
Çawa hildidin nayên du mêr tim ger û bik tên
Goga me bo çoganê me qet nagihê ser şek
Berkên me di nerdê û di şetrencê de boşin

Xama qederê ev bû li enya me nivîsî
Teşya felekê tayê kefen herdem dirêsî
Ber gora reş û tarî li benda me ye ey can
Daxwazê evînê ew ne yê zot û qurûşin

Qîma xwe emê bînin bi meyra şernivistî

Nîska ber kelî çandî bi kurtêlên şikestî
Maldar hewceyê malê dinê gerş û gemarin
Têr nabin ji dinyayê wekî berxê li kûşin

Qurtek ji meya den li derê meyxan û kunca
Nadim bi dur û cewher bi elmas û bi genca
Ka gencên di qarûn û suleyman û sikender
Ew dan hevê dînar û dirav paleyê pûşin

Me'd vê em li ser şopa siyamend û xecê bin
Şînwarê evînê li riya zîn û memê bin
Wek wana ez û tu bikevin rûpelê tarîx
Bes tîrêj te çav û gav li ser kir tim nexoşin.

Ne bi çûna teresî

Dilberê hate civanim bi krasê melesî
Pir di dîdarê ve şa bûm dil ji kêfa reqisî
Xanî û hindir bûne wekî mûm û fener
Rû ji hêla beş bi derket go cîhan tê çurisî
Wê bi nazî roj bi xêrek daye min vêra kenî
Go mi pir bêrya te kir bû ez te nadim bi kesî
Min digotê ser ser û çavan tu hatî bedewê
Dil ji ber işqa te bûye wek kulîlka çilmisî
Bûme wek kalê zemana pir perîşan û reben
Qet nema koka derana tev ji nanê repisî
Va di kuncê tarî û reş de bi xwe winda me ez
Bilbilê mest û hezînim girtiyê der qefesê
Lê bi dîna te li min dunya dibin mêrg û buhar
Wek ciwanê çarde salî ji bo min hewesî
Ka berî mirna xerab mal destê xwe destê mi da
Em biçin laleş tewafê ger tu êzîdtersî
Em bi çar goşiyê kurdistan bikin seyrangehê
Maye emrê min di gerdûnê de tûtinperesî
Ta di gorê de nebî hesret li min dîna welat
Merheba wê ga bi dojê ne bi çûna teresî
Ez bi bîr û bawerim dojeh li min dêsar bibit

Rengê Ibrahîm kurê Azer bigermê nahisî
Agirê musa li sînayê dema şewqê veda
Terh û dar û şax ne sotin ne ji pela rewisî
Yê ne aşiq be ew bê pare li dinyê û axretê
Ez bi kurmancî dibêjim ne bi zarê çerkesî
Rengê tîrêj ta li ser pêta evînê dil neso
Şerme jêre dil neca wa ku bid meqesî

Textora kul û derda

Bayê sibehê perde ji ber dêman hilavêt
Wek rojê ji pişt ewran bi gerdûnê xuya bû
Gêr bûm ez li ser qadê nr derman û ne raçêt
Dil gav ji ten derket bi yarê re teba bû

Ten maye li wê navê perîşan û belengaz
Nêçîreke nîv kuştî di bin çeng û lepê baz
Hawar û fîxana min giha yara min gulnaz
Textora kul û derda ku dermanêm li ba bû

Hat ser min û zendê xwe li zendê min dipêça
Destûr Ling û pê tev da ne ber qeyd û kelemça
Gûr kir wê li min agirê bajarê helebçe
Razîme bi vê xeşmê li min ev heq rewa bû

Zendê min û zendê wê li gel hev bûne çengel
Şabaş ji gulê re ku dibû hemdemê bilbil
Keyxesrewê mîdî wekû êrêş dayê daye babil
Aşûrî bi derkeftin kesek têde nama bû

Ew bax û rez û ew mêrg û naraz û gulîstan

Ew havîngeha bextûneser ew text û eywan
Keyxesrewê mîdî lê dibû paşa û siltan
Birca babilê ew ji mira koşk û sera bû

Mayînê ji dewra kevirî me xweş min dîtî
Ez bûm cengevanê dewleta hûrî û hîtî
Ez mam torevanê şewketa mîtan û sîtî
Bawer bike tîrêj ne yê va sal û dema bû.

Badeya lêvan

Ji birca sê tebeq şûxê hat nig min bi xemla zer
Bi wê şerpa hevirmêşî gelek têda li texma ser
Li dor şerpê seraser tev de rêşî gulabendin
Diraqisin tev li hawakî çep û rast bîn dîdî enber
Li ber bayê sibê xemle dilerzit xweş li bejna wê
Sitemkarên zêrqeseb têda biçirisin tev li semta ger
Di gerden gerdenîk sê rêz di ser sîngê de berdaye
Du rêz karbane yek baxe di nêvde kevrekî cewher
Bi temtala xwe qozxe bilinde wek sipîndarê
Li newqê xweş giradye bi qulp û û bestikan kumber
Li gor kêfa xwe xweşî dî kilîşek girt û da nîşan
Nigarê wê di rojê da xuya bû her wekî fener
Dema min ayîna dilber di rojê da bi çava dî
Ketim bê hiş li ber lingan bi işqê nû me kir bawer
Helestim ser piya wêga me herdû lêv ji dil mêtin
Bi min xweştir ji hingiv û ji ava zemzem û kewser
Heya saxim li dinyayê bese ew badeya lêva
Nema êdî dinoşim ez mey û badê ji dest meyger
Bi bawer ney gunehkar im dibêjim lê qepê nakim
Ji nîgaşa xeberdarim şev û rojan li ser dilber
Buhuşt û agir û berzex xuda ew pê tenê zane

Yeqîn û bawerî her dem di dil tîrêj dene ez benî.

Nabişkivî sorgul

Çi milk û mal û zêr û gund mi bê texmîn û endazê
Bi carek min li ser danî ji bo çavê te şehnazê
Berê vêga mi bawer kir gelek şaş çûn di vê rê da
Li ber çavê me leylan e nayê dest bi daxwazê
Neha dîsa ne poşmanim gelek çûne di vê rê de
Cezîrî feqehê teyra wekî hafiz li şîrazê
Cegerxwîn û hesen hişyar hejar û ehmedê xanê
Ketin dîrok û tarîxa ji bona te serfirazê
Li kurdistan venamre agirê işqê wekî pêta
li derbend û cezîrê li sîpan û li sêwazê

evîndar rengê kerwanê xwe davê agirê eşqê
wek ola muxan agirperest wek neftik û gazê
evînî ger nema cîhan seraser bê wê xweş nabe
gelo govend û dîlan xweş dibin bê saz û awazê
li qirş û qurmika qîzik eger navêje ser lawik
ewê ser gêj û terxan be li ber piştî ewî razê
heya bilbil li ser dara gulê hêsra nabrînî
tucar nabişkivi sorgul ji xew ranabe tolazî
ku darê mişmiş û sêva ji darin nemoçînin
tucar êmîş û ber nagerin li deştê û li hevrazî
jiyana bê evîn bo çi xoristê ev niazam danî
li ser dar û gul û insan teba û murx û narazê
bese tîrêj bid û bistîn ji ber kerbên di dinyayê
tu razî bî ne razî bî eve yara te şehbazî.

Ez û dem

Dema min çû bi valatî me tiştek jê neda ser hev
Riwa min bir bi ava çû di bû tarî li min bû şev
Ciwaniyê dev ji min berda ji semta min gelek dûrket
Çiqa min bankirî hove neda derdo ne da bersev
Xwezî rojek tenê jaro ciwanî ew bihata min
Minê derd û kul û êşê xwe jêre tev bi gota b'dev
Keç û qîzik diçin avê dibêjin roj bi xêr apo
Tu kale dest bi gopale xwe bid alî ji rê derkev
Wekî dodo qulingvanê bi deng naşî dibêm dodo
Xwe deyne va quling hatin dirava wê bi tirsin tev
Mi da bû pey evîna dilber lê qey nebû qismet
Me çav û gav xortanî li ser kir hê ne bes bû ev
Tiyê işq û evînê bû şev û roj meh û salan
Belê çipkim heya vêga ne noşî min ji kanya dev
Ji ber jana evînê dil seraser tim birîndare
ezê çipkim birîn kûre bi dermana nema tê hev
Evîn ku ew bibe xortik bi sond min dê bikuşta ew
Li darbestê dirêj bikra li ser naxistiba çerçef
Kefen bikra ji qerpalê belngazêd evîndara
Minê dahiştba gora reş û tarî wekî bandev
Li kêla ber serî daniya dû-sê xêzên di wêta reş
Eve warê te bengoro gonehkaro bese rakev

Ji nû tîrêj ewê qîrek bidaye dil bi mizgînî
Bese êdî rehet rûnê dilê xemgîn nema peykev.

Kuştiyê destê teme

Awira çavê te cana wek birosk û areş e
Ew kesê ku têkevî ber bê guman bextikreş e
Çayê hemrînê bi tûn ve qet xwe nagirî ew li ber
Rengê dîwarê li berlîn wê jê bin ve helwişîn
Wextê kawa ser li Ezdîhak ewî sed perçkir
Bê guman ew awira çavê te bû ew derfeş e
Neynika iskenderê romî bixwe cavê te bû
Keleha dara şikand xwe 'l ber negirt marê reş e
Yê birîndarê te bî ger bête ser û rûhil qudis
Fêde nakî şêx şems bê ser ji gelyê laleş e
Fêde nakî ew bixûra destê mitran û keş e
Min divê ez bême kuştin b'awirê çavê belek
Pakrewan ez herme gorê heqrewa û gerdeş e
Pir seza ye ku bi merdî kuştiyê destê te bim
Ne bi dest wawîk û hirça rovî û gayê beş e
Ta evînda bêne ser gora min bêjin kuştiyo
Ser hezar rehmet li ser canê te cê te pir xweşe
Ger wekî min tu bizanî û firseta emrê ciwan
Çerx û dewra firsetê dem sar ji xwe sih û şeş e
Bendê kanona evînê ger dixazî guh bidê
Xezelên tîrêj bixwîne ew ne dîn û serxweş e
Dilbera xwe ey bira nefroş bi dînar û dirav

Wê bi yek dî meghuere yê bugherî ew rûreşa .

Mebe şaş

Waye dilber bi tena tête bi meş
Tu bi wê işq û evînê mebe şaş
Rabe her pêşiyê ji bo çavên di reş
Tu bi wê işq û evînê mebe şaş
Tu li ber wê ramidîn gewdek û laş
Te birîndarekî bi xwînê mebe şaş
Wek memê berkên te ku bêne du şeş
Tu bi wê pencer û zîne mebe şaş
Mebe wek ji ber pêlan vekeş
Tu bi şêrîn û negînê mebe şaş
Tu li sîpan wek siyamendê keleş
bi xec û nal û girînê mebe şaş
werzê bê talik 'ecûr û şebeş
meçe nav tu b'lem û şînê mebe şaş
bê mejî boşin wekî gaêyn du beş
tu bi wî kum û civînê mebe şaş
wa li benda me ye gora teng û reş
tu bi rewşa dem û jînê mebe şaş
dem û wext derbas dibin bê hay û heş
tu bi lehd û sebt û înê mebe şaş
rengê tîrêj te nedî rojeke xweş

tu bi wê dîdar û dînê mebe şaş.

Ruhniya keç

Ji dil her dem birîndarim bi kîna keç
Div herdem bibînim ez di îna keç
Eger ku wê nebînim mest û sergêjim
Dibe sawêr li ber çavê min wêna keç
Çiqa te'le bi xelkê peytewa canim
Çi şêrîn eli ber çavê min xwîna keç
Dil û cerg û hinavên sotina dilber
Çiqa ez pê xweşim dîsa bi dîna keç
Eger umrêm li dinyê se'etek mabî
Ezê wê se'etê deynim rehîna keç
Eger ez xwe bikim gorî ne poşmanim
Ezê çipkim ji jînê bê evîna keç
Ezê çipkim ji mal û milkê dinyayê
Bese ez têr nebim carek ji bihna keç
Jiyana bê evîn pûçe ne hêja ye
Bela pêxwas û birçî bim bi evîna keç
Keç û qîzên cîhanê ez dikim gorî
Tucar nadim bi şêrîn û bi zîna keç
Bese tîrêj te çav û gav li ser danî
Mexabin ku nerazî maye hîna keç.

Ne diketim vê wertê

Dilber nexweşim ez wer li halê min binê
Ez xestiyê jana dilim textora minê
Destûr tilyên nazik li laşêm bipelîn
Dîsa min vejînê rewş û dilbera minê
Ger ku neba nedketim vê wertê tucar
Ev cewr û setem min ne didî karê minê
Jana min seraser tev ji bin destê te ye
Rehma te dixwazim ey gunehkara minê
Ma qey te di vê mi'b kujî bê sûc û sebeb
Hê xort û ciwanim gunehim yara minê
Kir jehr kerafî te li min umrê ciwan
Şêrîne bi min dinya gulîzara minê
Çend sal û aemanên mayî derbaskin emê
Ka çerxa felek çij mikî xunkara minê
Ka dighîne hevdû em li dunyê bi xweşî
Ya xod em bi hevdo şa nebin para minê
Ev xeşma dikêşim tev ji bin destê te ye
Sed ax û eman wer neke gulnara minê
Omîda dilê tîrêj bi cî bîne bes e
Nêzîk maye mirna malxerab çara minê.

Birê diyarî û şînî

Diyarê bo xunavê

Tu mizgîn û xelat e ey kova xunavê
Ji dilkî pak û paqij li te dikim silavê
Bi hêvî û omîdim tu herdem berdewam be
Ji bona xwendevana di her wext û gavê
Tu heft salî ciwanê pir bi şewq û şemal e
Ayetên te dixwînim li ber wê şewq û tavê
Gerek her dem tu carek wekî heyvê xuya be
Gelek derenge sê meh ta neqşekê tu bavê
Tarîx û tor û edeb hemî têda dibînim
Çikim ji mal û milka ji cewher û diravê
Bi temtêla xwe zax e lata me torevania
Bi keysem û fesal û şox û bejn zirav
Di xemlê da dibînim negar û neqşê manî
Ewesteya zerdeşt roj û şeveq dinalî
Tu kurdistan sernser bê wê şewqa xwe şakir
Tu naraz û buhare bêhna misk û gulavê
Du dotmama welate wê rojek bê ne dûre
Te bighêzin bi berbû jimara dê û bavê
Ew roja serxwebûne ey bûka ser bi xêlî
Tîrêj here ji dêvlê silava bik li zava.

Diyarî ji bo metîn

Ey kovara metînê tu pir bilind û paye
Ji me torevana tu wek baxê gula ye
Tu dehlek şînî ji her êmîşê têda
Sêv û bîhûk û hirmê li hevrazê çiyayê
Refê quling û qazan li jorê tim dirêsin
Keşwer bi paytextê şalûr û bilbila ye
Kel û germa havînê ya tîrmeh û tebaxê
Havîngeh û buhara dil bi kul û xemaye
Kul û derdê xwe têda ji bîr dikin bi carek
Şerbet û badeya min tu dermanê dila ye
Ez têda xweş dibînim ilmê melayê xanî
Ew felsefa cezîrî neqşên li eûpela ye
Ez dîwanên cegerxwîn şi'rên hejar û bêkes
Teva têde dibînim xweş ders û xwendega ye
Qanûna zend evesta ferşekin di neqşê manî
Heya bi ilmê tûrik hemû têde xuya be
Dema ku ez dixwînim dibim pespûr û zana
Mezdik li ku dimîne ne hinber û ne taye
Nadim bi dir û cewher bi yaqût û bi elmas
Li ber dilê mi herdem tu hê pirtir buhaye
Sed aferim ji wan re pir karekî sizaye
Bi hêvî me ji yezdan wekî heyvê tu her meh

Ji bo me berdewam be tu xweş heval û bira ye
Tîrêj timî binoşî ji kaniya metînê
Wekî tîkî rêwinda li xakî kerbela ye.

Kongira ewropî

Xweş nîşan û mizgîne ev kongira we danî
Yekîtî û biratî têda dikî xuyanî
Îro ji me tê xwestin bêtir ji her demên çûn
Destê xwe bidin hev di warê torevanî
Dîrok û tor û edeb heyvanê serxwebûn e
Kesî xwe jê bidê paş dijminê niştîmanî
Firset vêga ji zêr e neçî bi ton ji dest me
Di meydana xebatê pir xweş vî zemanî
Divê bi ilm û zanîn xwe rapêçin xebatê
Nabe tu kar û xebat bi kwikî nezanî
Yûnan tev em dizanin ket bin lep û destê turk
Bi tor û tarîxa xwe xwe j'bin destan deranîn
Dewlemend e kurdistan bi tarîx û tora xwe
Çiya û deşt û zozan çi mêrg û dehl û kanî
Çi hîm û heft û kevir newal û sirt û nehêl
Duriv lêne yeka yek ji xwîna erxewanî
Divê kevn û nuhê xwe bi hevdû ve girêdin
Rêçeke rast û durist ji wan bête deranî
Bi bawerî bidin em ser wê riya rast û xweş
Emê bighên armancê wek miletê cîhanî
Pîrozbahî dikim ez bi vî karê pê rabûn

Ev birîna pir giring kursiya me têda danî
Dawetnme ji mir hat bi derengî giha min
Mexabiya xwe tînim ku mam ji vî civanî
Silav li ser kesê ku rabûn bi vê xebatê
Wextê wî be her wek newroz û mihrecanî
Silav bi misk û inber li wê kom û civatê
Qebûl bikin ji tîrêj belê neb dilgiranî.

Çilsaliya Celadet

Ev e çil sal di xew de mîr celadet
Ne bes êdî heya vêga tu razî
Çiqa em bandikin pêjna te nayê
Emê çipkin ne hawar û negazî
Di kurdisatn de îro ey begê min
Li her cî kuştin û talan û ceng e
Li ser milet ji bala tê reşandin
Ji firokan ji kîmawên di xazî
Misliman med' kujin vêga ket û ber
Ku fermana serê kuda ye îro
Kesî wek wan nekir zor û setem qet
Li dunyayê ne faşist û ne nazî
Ji gorînê bi derkev ey tu haozan
Dibistana xwe vek rahêje xamê
Keç û xortan bide xwendin tu îro
Ji destpêka elifayê bi nazî
Çi ku milet tiyê zanîn û xwendin
Ji kanya te vexun ava jiyanê
Di benda rêziman wek sîbeweyhî
Di warê felsefê se'dê şîrazî
Dema ku em ji tarîxê bipirsin

Di ziman de tu mamûstayê kurd e
Tu paqişke zimanê bav û kala
Ji nav derxe tu zarê turk û tazî
Kesê wek te di kurdistan de îro
Sedê sal û zemanan peyde nabin
Ji bajarê mehabad ta bi amed
Ji berzan ta bi xelat û çayê mazî
Bi wê xama xwe ya serbest û aza
Tu binvîse di kovara hawarê
Tu bid zanîn kul û derdê me îro
Bi kurmancî bi soranî bi zazî

Tu ronahiyê bi derxe ey begê min
Welat pêkve bidî ber şewq û tavê
Ku dêwê çar serî meydanê xweş ke
Neyaran tev bide ber şûrê tazî
Li gerdûnê binêrî rêberê min
Ji roj ava heyanî rojhelat
Gelî bindest hemû rabûne ser xwe
Dixwazin pêşveçûn û serfirazî
Riya jînê çetîn û berbişaşe
Ne raxistî bi gulzar û kulîlka

Di cîna de divên zana û rêber
Di cîna de divên şûr û cengebazî
Di destpêka cîhanê ta bi îro
Heya ku xame û şûr tev nebin yek
Tu milet naghê warê cîhanê
Ji ber ku tevgera dem wa dixwazî
Eger ne bi zor be heq nayê sitandin
Heqî 'd destê neheqiyê zarzare
Heqê qelsa timî winda ye mîrêm
Ku şahid bin hezar miftî û qazî
Li gewdê masiyê behra binêre
Bi goştê masiyên qels ew dibin hût
Piling û şêr tebayên qels dixwin ew
Kevok taştê û şîva murxê bazî
Divê îro bi zanîn û bi xurtî
Bi kerwanê demê re em li kar bin
Wekî tîrêj dibê cê bav û kala
Ne şerme peygera hirç û beraz

Şîna rewşen bedirxan

Em dizanin ku berî çil salî mîr Celadet rehma xwedê dikir û li şamê li goristana şêx xalidê neqişbendî hat veşartin. Piştî çil salî pîreka wî rewşen li sahil rehma xwedê kir û ew jî anîn li nik mîr veşartin.

Erê rewşen diya hêja te zû barkir bi dil manî
Te xatir nexwest îro bi xeyd û dil bi kovanî
Te qîma xwe bi me nanî der û êl tev te xalî kir
Te em hiştin li wara wek xerîbê sirb û yonanî
Riya koça te pir dûre û dirêje lê veger nîne
Te cerg û dil hemî sotin bi dest agir li der danî
Sitêrek ronî û geş bû di ezmanê me kurda da
Mixabin ew sitêra geş vemirtî ku ji wî banî
Te war û cî guhest dayê ji sahil hate şam îro
Te bêrya mîr Celadet kir ku hatî cem bi mêvanî
Çi mêvanek bi temtêle ji çil salî we hev nedye
Memo û zînê gihiştin hev di gorê de bi şêranî
De herdû xweş li hev rûnên kul û derdên xwe tev bêjin
Welatê xurbetê zore ji rengê hebs û zindanî
Bila xweş bête bîra we Cizîr û şernex û cûdî
Di gel bica belek dayê cihê textê bedirxanî

Bedirxaniya bi ceng û şer cih û earê xwe berdabûn
Xwe nespêrtin neyaran qet xwe nefrotin bi erzanî
Li ber kêla ey dayê emê herdem serî xwarkin
Tu pespora gelê kurde tu remz û nav û nîşanî
Şoreşger û şehîdên me li pey hev tim şerîpanin
Mexabin ku tu jî îro kete rêza wî kerwanî
Bi hêvî me dema bighê civata wan beg û mîra
Se'îd û Qazî û Ihsan di gel seydayê berzanî
Silavê kurdê sûryayê li wawn box û berana bik
Bêje serfiraz bû kurd li başûr dewletek danî
Ti mizgînê bide Qazî şehîdê dîn û dunyayê
Şev û rojan ceng û lêdane digel sîpahê eyranê
Sef sal neyar tême bi ceng bi kuştin û ferman
Wek Ezdehak bi êş û gir gelo xwîna me dermanî
Diya kawa ji mer anî gelek kawa ewê bînî
Serê dijmin bi çakûça bikin perçe bi mêranî
Hezar rehmet ji dev tîrêj li ser gora te be rewşen
Furişta kaniya berzex kevoka baxê ridwanî.

Bîranîna Cegerxwîn

Ey dil tu hela rabe ji nêv cerg û xunava
Emrê xwe bi derda min bi tatûleke vala
Jîna min xuyaye ku roj lê çûye ber ava
Çax û dem û dem û dewranê me tev çûne bi xeyala

Rabe vê sibê rê bigre dil bê kerb û bê kîn
Rêber mede jar û bghê ser gora cegerxwîn
Rûnê tu li ber kêla serê sydayê hêja
Rengê goyînê ey dil bidî ber qîr û nalîn

Hêsran tu bibarî di çar hawêr û dorê
Ey dil bêje seyda ku bila rabe ji gorê
Deh salên te qedyan ma ne bes ev xwen û razan
Nanî bi xwere bînek û çend yar û heval

Wek carê berê em bicivn tev dil bixwestin
Bezmek şahiyê dîsa meydanê bibestin
Îro ji kul û derdan emê masekê deynin
Bergeştê li ser raxin digel cam û peyal

Maza me bila vêga ji êmîşê welatê

Sêv û mişmiş û hirmê ji zinar û xelat bin
Ava me bila kûpek ji bîngolê be ey dil
Mezrone û kerkûşe hebabê mey û ala

Rûnên em li ber masê digel sazbend û zana
Destan bipelînin em li ser şûşan û mazan
Qurtek ji meya taze bi mazaêre binoşî
Da ku serfiraz bi em ji nîgaş û metala

Dîwane bibin ey dil xwe winda kin seraser
Bavêjne ber hev şi'r û helbestan ji ezber
Dengê me bila bighê welatê jor û jêrî
Şehrê amedê heta bi zaxros û bi yala

Helbestan her wekî cewher ji derya hiş derînim
Çend marşên di cengê em ji xortan re bixwînin
Va îro li çar goşê welat birq û biroskin
Şev pêde hemî ruhniye wek find û şemala

Va xortên me îro her wekî şêr û pilinga
Derketne çiya dest birne ser keftê tifinga
Dem hatiye seyda xwe nedin îro tu alî
Şer gûr û girane ranezên va dem û sala

Qurpînga tifinga xumxum tê ji reşaşa
Mûran û mij girtiye ser gelya û kaşa
Çargoşê welat tev kuştin û talan û cenge
Zarok û keç û kal direvin der gund û mala

Dijmin girte kurdistan bi carek bi seraser
Milet daye ber hev wî bi dijwarî ketober
Wercarek binêrin hûn li halê xort û lawan
Tengav û perîşanin di wan zindan û çala

Pir şerm fihête rakevin vî heyamî
Meydanê bihêlin wisa yên wek te û namî
Vî barî nikarin em li ser milê xwe rakin
Yên wek we divên îro gelî şêr û şepala

Sund xwarine xortên bi kevrê çayê dêrsim
Kêla ber serê kalê Se'îd Ihsan û Rasim
Kolos û kumê Berzanî û Qazî Muhemed
Xwîna wan şehîdên li Mehabad û gelale

Soz dane hevûdû wan bi axa qoçegêrê
Pakrewanên gelyê zîlan kuştiyên dor çilemêrê
Sûnda bi Se'îd xan û Xalid begê Cibrî
B'term û cerdekên kurda li goncal û newala

Navêjin ji dest xwe ew tucar darê tifinga
Heta weko nestînin bi dest tola lehenga
Ew çar û omîdin canfidakarên welatin
Tev şêr û pilingin neviyên rustemê zal

Seyda li te mizgîn va Kurdên Guhderz û Dara
Mil dane hevûdû daketin cenga neyara
Ne b'hinera mîkut be tuçar sîng naçe xwarê
Tîrêj ku dibê zor hat xweşî êdî betale

Ey pêşkêşê milet tev bibin yek dem ji zêr e
Yê îro xebatê bike ew gernas û mêr e
Êşa me giran e janê avête dilê me
Derman nabe derdê me bi van felsefê vala.

Şîna Tehsîn Taha

Çi sersal û çejne kaka Tehsîn
Amêdî lê bû newroza welat î
Mexabin ez çiqa îro dinêrim
Xuya nakî di vê kom û civatê
Dipirsî min ji çend dost û hevala
Dipirsî min ji xort û pîr û kala
Dipirsî min ji wan gerden xezala
Digotin Tehsîn Taha çû wefatê
Dema ku min bihîst ez mame xayiz
Di ezmanan de perwîn bûye kadiz
Buhara min diçû lê bûye payiz
Gulêm weşiyan li ber serma sibatê
Welat ma dest li çar hawêr û alî
Mi go qey ev cîhan tev maye xalî
Nema bilbil di baxan dinalî
Nema ew qebqebq dengê kewa tê
Emir pêncî û çar salî mexabin
Kesê wek te ji dunyayê cuda bin
Gerim gora reş û tarî beta bin
Bi hesretiya ger û kar û xebatê
Hezar û neh ser nût pêncê zanê
Di roja sêşemê hêvdê Gulanê

Te koç barkir ji vê dewra cîhanê
Berî daye riya çûn û nehatê
Nema dengê te yî zîz tê guhê me
Nema tev radibin penc û rehê me
Ketin şînê dem û sal û mehê me
Li ser te bilbilê baxê xelatê
Nivîsandî me navê te'b nigarê
Bi tîpên zêr li ser enya buharê
Bela rondik li ser te bêne xwarê
Şev û rojan wekî ducl û ferat
çiqa bêjim tu hêjaye hunermend
Gelo ka ew sema û reqs û govend
Gelo ka ew dîlok û saz û sazbend
Li derbesnd û metîn û şax û latê
Keç û xortê me kurda şehlewndin
Tu dizanî tev li ser te derdemendin
Te koç barkir ji ewropa ji lendin
Berî da kurdistana rojhilatê
Ji gund û şehr û toprax û diyara
Dihatin pêşiya koçê b'hezara
Amêdî ma dibin toza siwara
Ketin şîn û girî û kêferatê
Erê tîrêj mirin ku hate insan
Venajînin ne textor û ne derman

Eger bê ser ji gorê qutbê geylan
Bi berbejn û niviştû şerqûbatê
Xuda herdem tu hêvî û reca ye
Tehsîn mêvane teşnê kerbela ye
Bila ew têr vexwe gerden ziwa ye
Ji kewser têr nebû j'ava heyatê.

Bîranîna Ehmedê Namî

Sivik rabe dilê xemgîn silavê mi ji bîr nek
Ji Qamişlo tu rê bigre here taxa Qudûrbek
Li ber kêla serê Namî tu rûnê ey dilê jar
Bi wî dengê xwe yî zîz tu bikî qêrîn û hewar
Bi qasî berg û darên Cûdî û şingal û Tore
Silavê min tu lêka ku bela rabe ji gorê
Dizanim ku bi hesretya welat çû neçarî
Ev e bîst sal bihurtin ew di gora teng û tarî
Ji xwer carek binêre ew ew li çar hawêrê gerdûn
Qirik talî demên reş ku çiqa dîtin hemî çûn
Eva roja me ya ruhnî ji hêla reş bi derket
Şiyar bûye ji tamara xewê bêçarê milat
Divê em ranezên êdî bikin kar û xebatê
Veger ey ehmedê namî j'riya çûn û nehatê
Dem û dewra te ye seyda tu bigrî xam û defter
Bidî ber şi'r û helbestan ji meydanê her û wer
Bi wan şi'rê xwe yê taze ji qayîşî neyara
Wekê bilbil qêrîn li ser lat û zinara
Keç û xortan tu serxweşke bi marşên xwey dicengîn
Berî bidne neyaran ew di gel wê ala rengîn
Berî nedne hevûdû ew ne dost e û ne rêber

Şêrê xwebxwe ji mer gelkî e ziyan e qet nekar e
Dema xwîn tê rijandin ew ji bin destê neyar e
Çi bêjim ez gelek heyfa mi tê l'xwîna ciwana
Hezar ax û keser seyda ji destê van nezana
Li ber çoganê tazî û eyran û turkan û laz in
Di meydana şeg û holan wekî gogê dibazin
Divê em ha j'xwekin êdî bese şerme mexabin
Divê ku em nebin alet di destê pîsê dijmin
Riya rast û durist û qenc bira herkes dibînî
Riya xwar û xerab û şaş me ji hevdû dixînî
Eger em guh nedin dijmin bi rastî em bibin yek
Bi sih û pênc milyonê kurd emê gogê bibin şeg
Ji hevdûre nebin sorset di dev maşka neyara
Bi koça miletê kurd xweş emê bighêjne wara
Zeman dostê me ye îro ku çipkin dikarin
Di bin destê neyaran de çima em dîl û jarin
Emê gazna ji kê kin ku dijmin rêberê me
Gelê bindest li gerdûnê bi dilsozê xwe parast
Ji kurda ez bi hêvî me berî bidne riya rast
Ku daxwaza me pêk bê em nemînin bend û kola
Ji karwanê dem û wextê nemînin em li çola
Li dunyayê bibin em jî xudanê tec û şewket
Dema ku em herin gorê nemînin dil bi hesret
Li ezmanê welat îro sitêrek me xuya be

Bila ala me jî îro di nêv ala de rabe
Çiqa bêjim xelas nabin kul û derd û xemên dil
Bi zancîrê me ev barê kiran berdaye ser mil
Tucar milet ji bîr nake xebata bavê samî
Hezar rehmet ji dev tîrêj li ser gora te namî.

Şîna Mele Ehmedê palo

Tenabînim di vê kom û civatê
Melayê Ehmedê palo tu kanî
Di vê dewr û dema kar û xebatê
Ji nav êlê te barkir b'dilgiranî
Di warê tor û eîwan û edeb de
Stêrek bû di ezmanê me kurda
Mexabin ew sitêra geş vemirtî
Nema ruhnî didî milet ji banî
Çi aû îro ji vî bextê me yî reş
Tu ket rêza şehîd û pakrewana
Giha Namî giha Hişyar û Bêkes
Cegerxwîn û hejar û mukrianî
Cih û warê îro maye vala
Tu kes nîne ku şpnwarê te bigre
Li ser textê evînê wek Cizîrî
Di warê perwerî de tayê xanî
Felek kor be bela çavê wê birje
Çiqasî xayine û bî bexte û xeware
Kesê wek te ji dinyê dil bi hisret
Biçin gorê di nav û zemana
Kesê wek te welat gelkî bi hacet

Ji derya gewr heya bigêje kerman
Welatê şehsiwar û textê xesro
Ji aptîkan heyanî aşokanî
Bi wî zarê xwe yî şêrîn ti rabû
Di gel xemê berî da tor û helbest
Gul û çîçek bi gulwaza tê hûnan
Te hêvistin ji rengê neqşê manî
Hevok û peyv turk û tazî û firs
Ji nav û ziman tev dane alî
Gelek raste û durust tev maye paqij
Ji kêm û şaşiyên îro deranî
Eger dîwan bi rastî bête xwendin
Dibistanek bilinde û xwendegahe
Ne bes şi'r ê belê ferheng û herdem
Tarîx û kevneyore û rêzimanî
Gulîstan û rez û dehl e seraser
Ji tuxmê her û êmîşê teda
Ji xwen da ra didî rengê buharê
Çiya û deşt û zozan û çi kanî
Çiya wek mêrg û narazê elî qadî
Sura bayê siba lê tê bi nermî
Li ber vedbin bi nevş û nêrgiz û gul
Kulîlkêd kesk û sor û ercewanî
Di baxan bilbil û şalûr dixwînin

Xunav ser pel û şaxa yê bade
Dema vedxwin dibên dîwan û serxweş
Buhar newroz û geşt û mihrecanî
Tê kêmasî ne kir seydayê hêja
Ji bo milet di ber kar û xebatê
Te ev barê giran tenha ji milê xwe
Bi destê xwe li ser milê me danî
Ji vî karê te pir sipase milet
Şev û rojan ji bîr naki tucarî
Di wijdanê me her tê bijî tu
Wefadare gelê kurd wek tu zanî
Hezar rehmet ji yezdanê dikpvan
Li wê gora te bî her wext û gavê
Wekî tîrêj dibê her dem bijî tu
Di nav baxê buhistê b'şademanî.

Şîna kemalê Ehmed

Ka di vê kom û civatê de ti nexuyaye kemal
Çiqa îro dinêrin ji me windaye kemal
Sed mexabin te berî daye riya dûr bê veger
Ev dema kar û xebatê bû ti ji me maye kemal
Te bi bîr û bawerî ket partiya û temîz
Ta bi mirnê li ser vê hedefê maye kemal
Jîrekê derweqt û gavê herdemê xortên ciwan
Te ji nav êla me barkir dej'me berdaye kemal
Teşneyê ava feratê tu xakî kerbela
Têr nebû j'reşa cîhanê zû te can daye kemal
Em li ser te mest û gêjin tim bi axînin bira
Ku qeder bê namihî şîn pûç û valaye kemal
Em çikin nayête hildan dest li ber vê qederê
Ev riya dûr û dirêj ya bav û kala ye kemal
Lê tu saxe tim di nav dil û wijdanê mede
Ku li ber çavê me sawêra te bes maye kemal
Wa buhara can û dil hişk bû gul û çîçek weşîn
bilbilê mest xeraman dev jê qeryaye kemal
medresa berzanî ya têde te xwendî dem bi dem
felsefek têr û tijî dersa me jê daye kemal
ew xebta ku tekir tarîx tucar nake ji bîr

bê guman ev dewr û dersa keç û xortaye kemal
ku tu çû baxê buhiştê bik silava yek bi yek
li şehîd û pakrewana cihê miryaye kemal
sed hezar rehmet ji dev tîrêj li ser gora te be
ev zemanê bê mirês yê kul û derda ye kemal.

Şîna Mihemed Baqî Melle

Em ji hisiça birêdiketin
Berê teksyê li ro ava bû
Çi rojek ne xweş bi ba bager
Serê payîza bi derd p kula bû

Li herdû hêla riya em li ser
Selefê siwar komê peyabû
Dema bi carê dirbêsiyê ketin
Serê reşkona ji me'v xuya bû

Me'j hev dipirsî ev çi halane
Ev govend û reqs û dîlane
Ev ne newroz û kêf û şahiye
Ev ne sersal û ne megrecane

Qîr û hawara pîr û keça tê
Rabû me pirsî ji wê civatê
Bersiva me dan bi ax û keser
Muhemed Baqî çûye wefatê

Dema me bihîst em mane xayiz

Baxê dil û can lê bûye payiz
Reng û nîşana wî xortê çelenk
Li ber çavê me bûye qelawiz

Dîsa em rabûn bi dil giranî
Hatin ser gora wî xwendevanî
Fatîhe li ser canê wî me xwend
Çend gurzê gula li ser me danî

Me got Baqî heyf û mixabin
Yên wek te îro miryê gora bî
Heval û hogir şînê bikêşin
Neyar û dijmin bi kêf û şa bî

Ji zû te barkir vê dem û dewrê
Welatê te ma bin destê zorê
Barê te yê giran maye di mil de
Kedera welat b'tere çû gorê

Serê xwe rake wekî şepala
Xweş bike dilê yar û hevala
Li xwendengeha mosko tu rûnê
Cihê te îro nemîne vala

Welat di destê dijmin dinalî
Hevalê dektor xwe m'd vî alî
Ev kar û xebat ji we tê xwestin
Meydanê îro nehêlin xalî

Mirina malxerab jê nîne çare
Dinya bê mirês ne cîh û ware
Çiqa li dinyê ku em bimînin
Berê me tim li axa sare

Ber roja xwe ye her kes bi dorê
Emê her bibin mêvanê gorê
Dest nayê hildan li ber melkemot
Tême bi xurtî b'kotek û zorê

Felek xayine her dem bi kînî
Çi xortên hêja ji me dibînî
Nahêle bighê kar û xebatê
Bi ber gorê ve ewî dişînî

Ma qey qedera me kurda ev e
Li dijmin roje li me tim şev e
Tîrêj dê bese çi qûteqûte
Dîwar bi guhin bi dû mekeve.

Fehres

1- bîranîna mem û zîn.
2- buhar
3- nîlson mandêla
4- buhar hatiye çogê
5- nîşan û gerafêt
6- bûka ser bi xêîlî
7- çikûs û comerd
8- kor û diya xwe
9- newroz
10- pirsa diya ciwan
11- bibin yek
12- marê di tûrê de
13- wê roj hilê
14- benda 11 ê adarê
15- birîn li ser birînê
16- di tarîxê de dewletek kurdî
17- berzanî hat welat
18- ez û felek

19- kela xwînê
20- nezanî derdekî zor e
21- xwena min û bersiva cegerxwîn
22- sed xwelî li wî serî
23- berzanî nemirye
24- pakrewan
25- siwarê dînasor
26- ez û bilbil
27- kabûsê mirinê
28- ez û tûtim
29- mişk û pisîk
30- şi'ra melê kurd
31- bersiva şi'ra melê kurd
32- ji tarîxê bi pirse
33- welatê min
34- şêrê kurdistan
35- çûna bê veger
36- xirqe û bendik
37- ne poşmanim
38- cam û peyal
39- heyva li çarde
40- xemla qedîf
41- gula zer
42- xama qederê

43- ne bi çûna teresî
44- textora kuê û derda
45- badeya lêvan
46- nebişkivî sorgul
47- ez û dem
48- kuştiyê destê me
49- mebe şaş
50- ruhniya keç
51- ne diketim vê wertê
52- Diyarî bo xunavê
53- Diyarî bo metîn
54- Kongira ewropa
55- Çil saliya celadet
56- Şîna rewşen
57- Bîranîna cegerxîn
58- Şîna Tehsîn Taha
59- Bîranîna Emedê Namî
60- Şîna M.ehmedê palo
61- Şîna Kemalê ehmed
62- Şîna M.baqî mele

www.tirej.info